



Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdi Miqdad Mîhed Bedirxan


# Armananc

Rojnameya Mehane


Hejmar, No: 142

Îlon  
September 1993

Buha - Price  
15 SKR, 3DM



Mehmet Sincar



Metin Ozdemir

Qereperiya wezîrên dewletê ya li ser girtina qatil vala derket

## Qatil Dewlet e

Dewletê bi kiryarên xwe da diyarkirin ku qatilê Mehmet Sincar ew bi xwe ye. Gotina ku qatil hatiye girtin, derew derket. Dewletê rê neda ku merasîma veşartina cenaze çêbibe. Bombeyek hat avêtin mala ku şîn lê hebû.

Di 4'ê Îlonê de komek parlamenterên Partiya Demokrasiyê (DEP'ê) ji bo lêgerîn, lêkolîna li ser "cîneyetên qisas nediyar" li Batmanê bûn. Dema ew li kolanan bi esnaf û xelkê re li ser van cîneyetan dipeyivîn, ji 3-4 kesan bi çekên otomatîk parlamenterên DEP'ê gulebaran kirin. Parlamenterê Mêrdînê Mehmet Sincar û endamê Komîta Karkir ya DEP'ê ya Batmanê Metin Ozdemir şehîd ketin, 3 kes jî birîndar bûn. Di nav birîndaran de parlamenterê Batmanê Nizamettin Toguç jî hebû.

Cenazê Metin Ozdemir li Batmanê hat veşartin, yê Mehmet Sincar ji bo merasîma li ber deriyê meclîsê bo Ankarayê hat guhestin. DEP'ê ji ber bêdengiya meclîsê li hember "cîneyetên qisas nediyar" biryar girt ku li ber meclîsê tu merasimekê çêneke, li şûna wê, wê li merkeza DEP'ê çêbibe. Lê di gel ku serokcumhur û serokwezîr soz dan ku wê bibin alîkar ku merasîma canezê li gor urf û edeta çêbibe jî, polîs û hêzên dewletê rê nedan DEP'ê. Herweha rê nedan ku xelk ji bo merasîma herin Ankarayê. Li Ankarayê jî rênedan xelkê ku li ber merkeza DEP'ê bicivin. Polîs êrîşî wan kir, bi jop û çoyan dehan kes birîndar kirin. Lê rê dan hin ajan û provakatoran ku li hember merkeza DEP'ê bimesîn û sloganên wek "Bimre PKK" biqêrin.

Li ser vê yekê serokê DEP'ê Yaşar Kaya beyanek da û got DEP'ê û malbata Sincar biryar dane ku heta dewlet destûra ku ew

li gor urf û edetê xwe cenaze rakin, nede, ewê laşê M. Sincar ji morgê wernegrin.

Li ser vê biryara DEP'ê dewletê cenaze bi teyarê bir Diyarbekir û ji wir jî bi helikopterê bir Kiziltepe. Bêyî ku malbata Sincar û nas, dost û hevalên wî beşdar bibin, cenaze veşartin.

Hovîti bi vê jî nema. Şeva 10'ê Îlonê hin "kesên nenas" sê bombe avêtin ser banê mala Sincaran ku xelkê lê şîn dikir. Dûre jî bi çekên otomatîk gulle li malê reşandin. Di vê êrîşê de 6 kes birîndar bûn. Di dema êrîşê de li mala Sincaran hin parlamenterên DEP'ê jî mêvan bûn.

Di rojên pêşî yê bûyerê de ji bo reaksiyona xelkê sist bikin û kela wan deynin, wezîr û berpirsên dewletê yê wek Mehmet Golhan, Yildirim Aktuna, Mehmet Gazioglu, Unal Erkan, yek li dû yekî di televîzyon û rojnaman de xwe dan nîşan dan û gotin "Em dizanin qatil kî ne", "gelek kes di destê me de ne". Heta hin ji wan frêna xwe negirtin, gotin "qatil bi xwe di destê me de ne". Ji bo bi telaş û heyecanek mezin li dû hev derdike-tin, peyvên li dijî hev jî dikirin. Rojnamên Tirk jî alîkariya wan dikirin, digel ku rastî dizanibûn jî, digotin sibê an di nav du rojan de wê qatil nîşanî xelkê bidin. Lê pişt re, tu deng ji wan wezîrên dewletê ku dor nedidan hev demeket.

Hemû berpirsên dewletê û medya ev kuştin dikirin stûyê Hizbullah. Heta ew kesên ku digotin girtî

ne, wek endamên Hizbullahê didan nasîn. Li gor rojnama Ozgur Gundemê Hizbullah li ser van îddîayan, telefonî buroyên wan yê li Wan, Mêrdîn, Agirî û Cizîrê kirine û gotine ku tu tîkiliya Hizbullahê bi vê kuştinê tune. Heta qatilê rastî neyê girtin, qatil dewlet e. Wusa xuyaye ku wê qatilên rastî neyên girtin jî.

Kuşîna parlamenterekî Kurd, di qada navnetewî de tu olan neda. Du-sê dengên sist derketin û hew.... Hêzên Tirk jî bes bi çend gotinên diplomatîk bûyer protesto kirin. Hêz, dezgeh û xelkê Kurd bûyer bi tundî protesto kir. YEKBÛN (Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurd) Komîta Ewropayê li ser kuştina M. Sincar û M. Ozdemir beyanek belav kir. Di beyanê de got: "Yên ku gulle teqandine kî dibin bila bibin, li paş cîneyeta Mehmet Sincar û Metin Ozdemir, bi ordî, polîs, dadgeh, parlamento, serokkomar, hukûmet û çapemeniya Tirk ya bêşexsiyet ve dewleta Tirk bi xwe heye." Di dawiya beyanê de jî weha tê gotin "Li hember vê rewşê, ji gelê Kurd û rêxistinên Kurd re bes riyek dimîne. Ew jî yekkirina hemû îmkânên xwe û berxwedana li dijî êrîşkarên ku welatê me dişewitînin û hildiwêşînin e." Herweha PSK, PKK û hin hêzên din jî bi beyanên xwe bûyer protesto kirin. Kovarên Kurdan, sendîka, baro bûyer protesto kirin.

Girtiyên siyasî yê girtîgeha Mûşê, Sigmalcilar, Diyarbekir, Samsûr (Adiyaman), Meletiya, Entab û Bûrsayê ji bo protestokirina vê bûyerê ji bo demekî sînorkirî ketin berxwedana birçîbûnê.

Mirza Bextiyar

## Meleyekî Tirk Kurdek ji mizgeftê qewitand

Mecid Salih "Mele ji me re got Kurd tunene, hûn Tirk in. Hûn terorist in, ji mizgeftê derkevin".

Roja 11'ê Îlonê Kurdekî penaber ku 8 sal e li Swêdê, li Stokholmê ye ji bo nimêja nîvro diçe mizgefta taxa ku gelek musulman lê dijîn; Rinkeby'ê. Ev ne cara yekem e ku ew diçe vê camiyê. Beriya wê carê 4-5 carên din jî çûye. Lê vê carê dema meleyê camiyê pê dizane ku ew Kurd e, bera wî dide.

Piştî me bûyer bihîst me xwest ji devê wî guhdarî bikin: Mecid Salih li ser bûyerê ev agahdarî dan: "Ez ji Kurdistanê Başûr im, Xwedê bişewitîne bi ser Ereba, Tirka de (diyar bû pir bi hêrs bû. Hin di tesîra bûyerê de bû). Ez û du piçûkên xwe çûn Rinkeby ji bo lazimtiya xwe bikirin. Wexta nimêja nîvro bû. Ez û ew çûn mizgeftê. Ez çûm hundur. Dema vegeyriyam min nihêrt mela li ser piçûkên min hêrs dibe, Min got dibe piçûk bê edebî kiribin, min xwe hazir kir ku li wan hêrs

bibim, min bihîst mela ji wan re dibêje "hûn Tirk in, hûn ne Kurd in. Kurd tunene". Ew jî dibêjin na, em Kurd in, ne Tirk in.

Dem a ez li hundir bûme, mela çav bi piçûkên min dikeve bi wan re Tirkî dipeyive. Ew jî dibêjin em bi Tirkî nizanin. Em Kurd in. Li ser vê yekê jî mele li wan hêrs dibe. Dem a min xwe gihand wan, min ji melê re got: Xwedê ji te razî piçûk bi Tirkî nizanin, ne Tirk in, Kurd in. Li ser vê peyva min mela bêhtir bi hêrs bû û li min qêriya got; "hûn terorist in, bicehime ji vir here û carek din jî neyê vir."

Du-sê Tirkên din jî hatin. Hege piçûk ne bi minre bûna minê zû bi zû terka mala Xwedê nedikir. Min got ez li ba polîs şikayet bikim, lê dîre min got ne caîz e mirov li ser mala Xwedê hevûdu şikayet bike. De bira ka em çi bikin".

## Îsraîl û PLO li hev hatin Filistînî bi hev ketin

Bi îmzekirina plana otonomiya li Gaze û Erihayê dijminatiya 45 salan ya di navbera Îsraîl û Filistînê de bi dawî hat.



Îzak Rabîn, Yaser Arafat û Bill Clinton di merasîma lihevhatinê da

Di 13'ê Îlonê de, li Waşingtonê di navbera Îsraîl û PLO de gaveke dîrokî hat avêtin û peyman a aştiyê hat îmzekirin. Li gor vê peymanê PLO plana otonomiya li bajarê Gazê û Erihê qebûl dike. Piştî peymanê Yaser Arafat got

ku; "Şerê ji bo aştiyê ji şerê din diwartir e". Û Arafat ev plana otonomiyê wek gaveke ji bo dewleta Filistînî dibîne. Lê rêxistinên din yê Filistînyan li dijî vê planê ne.

Armananc hin aliyên tarî yê dîroka me ron dike

Ji deftera

Komela malbata Bedirxaniyan

rûpel: 7

Mehmet Uzun û çîroka dizîya "Tu"

rûpel: 9

Çend problemên Kurdên Sovyeta berê

rûpel: 6

Rojeva Mehê

Îsraîl li ku yên me li ku

Bûyera herî balkêş û girîng a ku wê meha dawiyê li Rojhilata Navîn rû da ew bû ku Îsraîl û Rêxistina Rizgariya Filistîne meşrûyeta hebûna hevdu qebûl kirin û ji bo çareserkirina pîrsa Filistîne û çareserkirina têkiliyên navbera Yahûdî û Filistîniyan li Amerîkayê bi peymanekê gava pêşin a ber bi aştiya tevayî avêtin.

Gava meriv bala xwe bide giranî û têkilheviya pîrsê, wê gavê çêtir xwiya dibe ku avêtina gaveke wiha ne hêsan e, ne karê herkesî ye, ji bo avêtina gaveke wiha, cesareteka medenî ya mezin, têgihîştin û kamilîneke bi rêk û pêk û realîstiyeka rewşnasîna rastîn divê. Sebir, tehammul û fedakarî jî di avêtina wê gavê de rolên esasî digirin.

Divê mirov rastiya han jî ji bîr neke ku ev xusûsiyet ne tenê ji bo aliyekî lê ji bo herdu aliyan derbas dibin. Çimkî li aliyekî welatê Filistîniyan ji alî Îsraîlê ve hatiye dagirkirin, piraniya wan ji welatên xwe hatine sirgûnkirin, yên mayî li ser erdên xwe bûne penaber û ketine kampan, ji mafên xwe yên milî û demokratîk hatine bêparhiştin, ev e 40-50 sal e di şerekî xwînî yê berdewam de ne, tîrên kuştin, li cîhanê bi terorîstiyê tîrên îthamkirin. Bi ku ve diçin her dewletek Erebi jî sîleyekê li paçika hustuyê wan dide, serokên Ereban wan ji bo maf û berjewendiyên xwe bikar tînin. Li aliyê din Îsraîleke bi çend milyon nifusa xwe di nîveka bîst û du dewletên Erebi ên dijmin de bûye xwediyê dewleteka nûavakirî. Çarmedora wê dijmin in. Hebûna wê, mafê jiyana wê qebûl nakin. Hemûyan armancên xwe kirine yek ku Yahûdiyan di Derya Sipî werkin. Ambargo danîne ser dewleta Îsraîl, dixwazin wê bifetîsin. Heta navên wê dijminatîya pîralî meriv dikare bêje ku xwe bera kûrahiya sedsalan didin.

Di rewşeka wiha de her du alî digihîjin wê qenaetê ku bi dijminatî û şer û pevçûna heta îro tu mesele çareser nabin. Ne Erebi dikarin Îsraîliyan di behrê werkin û ne jî bîyî mafnasînekê Îsraîlî dikarin xwe ji serêşîya Filistîn û Ereban xelas kin. Herdu alî jî di daxwaz û îdîayên xwe yên berê gavan bi paşde davêjin, tîrên mewqîfekî weka îro ku bi peymanê Waşingtonê hatiye îmzekirin.

Ev gav jî bo Erebi û Îsraîliyan rûpelekî nuh vedike. Dê ji wê qedera Rojhilata Navîn were guhertin.

Ev yek nimûne û dersek gelek mezin e ji bo dewletên Erebi, Tirk û Faris jî ku Kurd ji mafên xwe yên milî û demokratîk bêpar hiştine.

Gava mirov pîrsa Kurdî û Filistîniyan bide berhev tu caran pîrsa Kurdî li hemberî dewleta Tirk, Îran, Iraq û Sûriyê hinde giran nebûye ku qasî ya Filistînî û Ereban li hemberî Îsraîlê giran e.

Tu caran 22 dewlet li pişt Kurdan ranebûne û xwe nekirine dijminê Tirk, Erebi an Farisan û negotine ku emê wan di bahrê werkin. Kurd her demê, mileteki tenêmayî bûye, ne ku her jî bo tu dewletê nebûye xeter, neşiyaye garantiya jiyaneke serbest û bi ewle jî bidest xe. Hin hêzên siyasî yên Kurdistana Tirkiyê ne tê de, li her çar perçên Kurdistanê jî tu caran Kurdan doza dewletek serbixwe jî nekirine. Li Kurdistana Tirkiyê jî îro daxwaza dewleta serbixwe her ku diçe kiz dibe, ber bi jiyaneke serbest a muşterek ve têkoşin berfirehtir dibe.

Çendin Kurdan zor û zilm û qetîlamên ji yên Filistîniyan dîtîbin ji dijminatîya Kurd û Erebi û Faris û Tirkan hiç negihîştîye wê kûrahiyê ku di navbera Erebi û Yahûdiyan de hebe. Tevî hemû van hêsanîyan jî îro bi mîjî, kultur û hezîmkirina xwe Tirk, Erebi û Faris bi dehsalan ji Îsraîliyan paşdetir in. Qasî Îsraîl ne xwedî cesareteka medenî ne, ne hemdemî ne, ne realist in ne jî tehamulkar in. Jixwe ji alî fedekarî û kultura demokrasîyê maşallah yek car bêpar in.

De îcar yên me li ku Îsraîlî li ku? Heft xwezî bi wan!

Ji hemî vêkxistinên Kurd ên siyasî, çandeyî û komelî ra nameya vekirî

Serok û kargêr û endamên berrêz,

Wek ku tê zanîn, Dastana Neteweyî ya Kurdî "MEM Û ZÎN" di sala 1995'an da 300 saliya xwe dadigire. Hozanê nemir û birewerê gewre Ehmedê Xanî, nivîsîna wê dastana rûmetgiran di sala 1695'an da tamam kiriye û paşê jî ew wek mîraseka neteweyî jî neteweyê Kurd ra hiştiye.

Ez dixwazim bi kêfxweşî û bextyarî bi raya giştî ya Kurd bidim zanîn ku, ez ji despêka sala 1992'yan vir ve li ser "MEM Û ZÎN"ê dixebitim û wê ji çapeka nû ra amade dikim. Amanc û daxwaz ev e ku ez çapa wê ya nû berî Newroza sala 1995'an bigihînim destê xwendevanê Kurd. Ez dixwazim wê yekê jî bidim zanîn ku, min "MEM Û ZÎN" wergerandiye Kurdiyeka xwerû jî. Di çapa wê ya nû da, Kurdiya wê ya orjînal û Kurdiya wê ya xwerû dê pêkve bîr çapkirin û li rexê hev cî bigirin. Bi wî awayî, xwendevanê Kurd, dê bi Kurdiyeka xwerû, îmkana xwendina wê û têgihîştina naveroka wê bibîne.

300 saliya "MEM Û ZÎN"ê ji bo me Kurdan bûyereka gelek girîng e. Di dîrokên hemî neteweyan da bûyerên weha ciyekî pîr girîng û bilind digirin, bi civîn û şênayiyên mezin tîrên pîrozkin. Bîranîn û pîrozkirina salvegerên weha giyanê neteweyî xurt dike, bingehê hevgerîna neteweyî zexm dike, têgihîştina neteweyî jî fire dike. Eşkera ye ku ihtiyaca me Kurdan ji hemî neteweyên di pîrtir bi bîranîn û

pîrozkirina salvegerên bûyerên neteweyî heye.

Min, wek nivîskarekî Kurd ê ku li ser "MEM Û ZÎN"ê dixebite û wê ji çapê ra amade dike, di tarîxa 21 Adar 1992'yan da ji UNESCO ra nameyek nivîsî û pêşniyaz kir ku UNESCO sala 1995'an "Sala Ehmedê Xanî û MEM Û ZÎN"ê ragihîne û bi wî awayî piştgiriya xwe ji çandeya Kurdî ra nişan bide (ez fotokopiyên wê nameya xwe ya ji UNESCO ra jî digel wê nameya xwe ji kovar û rojnameyên Kurd ra dişînim û bi wî awayî cara pêşin ji raya giştî ya Kurd ra eşkera dikim û hem bi vêkxistinên Kurd, hem jî bi raya giştî ya Kurd radigihînim).

Lê belê UNESCO heta nuha pêşniyaza min qebûl nekiriye, tewr bersîva nameya min jî nedaye. Semedê wê yekê jî ev e ku dewleteka me Kurdan a xweser tune; UNESCO jî vêkxistineke dewletên xweser e, ku endamên Neteweyên Yekbûyî ne.

Lê belê em Kurd bi xwe dikarin wê wezîfeya neteweyî pêkbinin û sala 1995'an "Sala Ehmedê Xanî û MEM Û ZÎN"ê ragihînin û li gora giringiya wê, wê bi konferansan, bi semîneran, bi civînên çandeyî, bi şênayiyên folklorî û wd. pîroz bikin.

Eşkera ye ku ev kar jî tenê bi destê vêkxistinên Kurd ên siyasî, çandeyî û komelî tê pêkanîn; bi peyveka di, tenê vêkxistinên Kurd dikarin wê wezîfeya neteweyî binîn cî û ji bo bîranîn û pîrozkirina wê bûyera neteweyî benamey-

ên pêwîst amade bikin, wan bernameyan pêkbinin û bi wî awayî giringiya 300 saliya "MEM Û ZÎN"ê bi kitleyên gel ragihînin.

Bi wê amancê û bi dilekî tijî hêvî, min biryar da ku ez wê şolê bi vêkxistinên Kurd bidim zanîn û wê pêşniyazê jî wan ra pêşkêş bikim. Ji ber ku îmkânên min tunin ez xwe bigihînim vêkxistinên Kurd û wê pêşniyaza xwe yekser bigihînim wan, ez wê nameya xwe ya vekirî digel nameya xwe ya Îngilîzî ya ji UNESCO ra ji kovar û rojnameyên Kurd ra dişînim û dixwazim bi riya wan, bi navbercîtiya wan, bi hemî vêkxistinên Kurd ên siyasî û çandeyî û komelî ragihînim.

Ez, wek nivîskarekî Kurd ê ku li ser "MEM Û ZÎN"ê dixebite, li hemî vêkxistinên Kurd ên siyasî û çandeyî û komelî pêşniyaz dike û ji wan tika dikim ku:

1- Sala 1995'an bi navê "Sala Ehmedê xanî û MEM Û ZÎN"ê qebûl bikin û ragihînin.

2- Biryar bidin ku Newroza sala 1995'an li Kurdistanê û li derê welêt bi navê "Newroza Ehmedê xanî û MEM Û ZÎN"ê bê bîranîn û bê pîrozkin.

3- Biryar bidin ku 300 saliya "MEM Û ZÎN"ê di sala 1995'an da li Kurdistanê û li derê welêt bi konferansan, bi semîneran, bi civînên çandeyî, bi şênayiyên folklorî û wd. bê bîranîn û bê pîrozkin.

M. Emîn Bozarşlan  
UPPSALA, 21/09/1993

Agahdariyeye Girîng

Kurdên şerefmenî!

Xewna me gişan bûye rastî; beşê herî mezin yê Kurdistana Başûr rizgar bûye. Bi renckêşî û xuhdana gelê me azadî û demokrasî stûnên xwe li vî perçê welatê me dadîçikînin.

Û ev azadî û demokrasî nuha jî pêwîstî gelek qurbanî û fedekariyê ne.

Di bin barê du blokan de nala Kurdistanê ye û dijmin ji çar rexan ve dixwazin Kurdistana federe bixeniqînin.

Îro roj hatiye em Kurdên derveyî welat her roj ji wîdanê xwe bipirsîn; va ye salek bi ser damezirandina dewleta Kurdî re derbas bû û min çî alîkariya wê kir?. Hêwelatîyên Kurdistanê bi zîkê birçî de-

mokrasî û azadiyê diparêzin. De bila em jî bi alîkariya xwe di vî erkê pîroz de beşdar bibin.

Ji bo wê amancê roja 27.08.1993'an li Stokholmê Kampanyaya Piştgiriya Hukumeta Herêma Kurdistanê dest pê kiriye û dê çend rojan bidomîne. Her wisa dê 25.09.1993'an li seranserî Swêdê dest pê bike.

Ev kampanya ji aliyê BuroyaParlamento û Hukumeta Herêma Kurdistanê û Fonda Alîkariya Kurdistanê ve tê bi rê ve birin.

**Buroya Parlamentoya Herêma Kurdistan li Swêd û Fonda alîkariya Kurdistan li Swêd**  
Postgiro Nummer 468170-6 SWEDEN

BANG

Xuşk û birayên Kurd yên zîndanî û mirov û dostên wan!

Komîteya Piştgiriya Girtiyên Kurd ên Polîtîk ya bi ser Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê bi dilekî pîr kêfxweşî dixwaze alîkariya girtiyên Kurd bike. Em dizanin ku girtiyên Kurd li van welatan û li zîndanên welatên din, di rewşeka pîr xirab de dijîn. Armanca me ew e ku em maddî, manewî piştgiriya girtiyên bikin, dengê giştî yê Swêdê û yê Ewropayê, Amnestî û rêxistinên mirovhez ji rewşa girtiyên agahdar bikin. Em hêvîdar in her girtiyek Kurd, yan her Kurdek, çî li zîndanê, çî li derve komîteya me ji rewşa zîndanên û girtiyên agahdar bikin. Em li benda nameyên we ne.

Li ser navê Komîta Piştgiriya Girtiyên Kurd ên Polîtîk

Selam Cizîrî

**Navnîşan:**  
Komîta Girtiyên, Box 49090  
100 28 Stockholm- SWEDEN

Swêd Kurdên Iraqê bi şunde vedigerîne


Daîra Penaberan ya Swêdê difikire ku ew Kurdên ku ji Kurdistana Iraqê tîrên Swêdê û heqê runîştin û kar dixwazin û sedemên wan yên polîtîk tunebin, paşve bîr vegerandin.

Ji berpirsiyarekî Daîra Muhaciran Fredrik Martinsson dibêje: "Li wê mintîqa Kurdistanê ku di bin parastina Yekîtiya Miletan de ye, rewş baş e. Ji ber wê jî em rast dibînin ku ew Kurdên ku ji Kurdistana Iraqê tîrên, em dikarin wan bi şunde verêkin. Lê hîn biryar neketiye jiyane, ji ber ku itîraz lê hatiye kirin. Em li hêviya biryara meqamên bilind in û emê li gor wê biryare hereket bikin..."

Armanc

Rojname Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine  
**Redaksiyon:** M. Elî, Hesen Mizgîn, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, **Redaktorê berpirsiyar:** M. Elî, **Berpirsiyarê beşê Dimilki:** Malmîsanîj, **Berpirsiyarê rûpelên edebî:** Ehmed Huseynî  
**Utges av:** Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen  
**Abonetî/Prenumeration:** Abonetîya Salekê, Li Skandinaviya: 200 SKR, Maqam/Myndigheter: 400 SKR, Li Ewropa: 50 DM. Li derveyî Ewropa: 40 \$,  
**Anons/ilan:** nîv rûpel/en halvsidan 2500 SKR  
**Telefon:** 46-8-803135 **Fax:** 46-8-801825 **Postgiro:** 50 37 99-9  
**Adres:** Box: 152 16  
161 15 Bromma/Sweden  
ISSN: 0348 7385

## Yaşar Kaya hîn di girtîxanê de ye




Serokê DEP'ê Yaşar Kaya roja 14'ê Îlonê ji aliyê polîsan ve li Ankarayê hat girtin, roja piştî wê jî ji aliyê Mahkema Ewlekarî ya Dewletê hate girtin û dewletê ew avêt hepsê. Sedema girtina wî peyva wî ya li Kongra PDK-Iraqê hat nîşan dan. Li ser girtina Yaşar Kaya, ew kesên ku dema qedexeyên 12'ê Îlonê li ser wan bûn li ser navê demokrasiyê diqîjyan, bêdeng man.

Li ser girtina Y. Kaya parlamenterê Mûşê yê DEP'ê Sirri Sakik weha got: "Pêşî, hevalê me Mehmet Sincar kuştin, dûre cenazê me nedan me, dû re girtin ser şîna me, nuha jî serokê me Yaşar Kaya girtin. Ev hemû didin diyarkirin ku hêzên dewletê li hember me îlana şer kirine".

Li ser bêdengiya partiyên siyasî yên Tirkîyê, li hember girtina Y. Kaya, DEP, tîkiliyên xwe bi hemû partiyên re birrî. Parlamenterê DEP'ê yê Adiyamanê Mahmut Kiliç weha got: "Emê bi partiyên ku li hember girtina serokê partiyekê bêdeng dimînin re çî bipeyivin?"

## Bîranîna Şerefkendi û hevalên wî



Roja 18'yê Îlonê li Stokholmê ji ber munasebeta salvegera yekem ya şehîdbûna Dr. Muhemed Sadiq Şerefkendi, endamê Komîta Navendî û berpirsiyarê PDK-Î li Ewrûpayê Fetah Abdulî û berpirsiyarê Komîteya Almanya ya PDK-Î Humayun Erdelan, civînek bîranîne ji aliyê Komîteya Hekarî ya Hêzên Siyasî yên Kurd û Kurdistanî li Swêdê hat pêkanîn. Di civîna bîranîne de li ser jiyana û şexsiyeta şehîdan hat peyivîn û filîm hat nîşandan. Li dor 250 kes beşdar bûn.


## Pereyên Kurdan di berîka dewletê de

Tirkîyê ev demekî dirêj e bi skandalên ruşwetê diçeliqê. Di esasê xwe de li Tirkîyê dezgehên ku ruşwet nexwin tunene. Lê hemû veşartî dimînin. Yên ku derdikevin rûye avê jî encama nelihevkiyê ruşwetxura ye. Bûyera dawî jî di netîceyên dijayetiya waliyên dewletê derket rastê. Tenê ne perê reş û qirêj derket ber çava, herweha bîna gelek tiştên gemarî hat. Lê dewletê zû bi zû ser vê mesele girt. Ji ber medya Tirkî ne azad û xwedî şexsiyet e, wan jî dengê xwe birrî.

Ji van tiştên gemarî yek jî ew bû ku Hayrî Kozakçioğlu dema "Waliyê Super" yanî yê Kurdistanê bûye, perê ku ji Yekîtiya Netawan ji bona penaberên Kurdên ji

Kurdistanê Iraqê re hatiye, li wan belav nekiriye, kiriye zîmeta xwe. Dema tayina Kozakçioğlu derdikeve Stenbolê ji wî perî 2 milyar lîrayî jî bi xwe re dibe.

Ji bo Kurd bi terore dewletê dest û piyê wan bendkirî û bêxwedî ne, tu kes hesabê vê yekê



Hayrî Kozakçioğlu

nepirsî. Tehdîda serokcumhur Demîrel tîr kir ku her kes bêdeng bimîne û meselê jî bir bike.

Demîrel, got: "Dema bê aşkere kirin ku li ser navê wafî ji hesaban jî kê re perê hatibe hinarîtin, wê dewlet bikeve tengasiyê".

Komîta Ewrûpayê ya YEKBÛN'ê ji KNO daxwaz kir

## "Rê nedin ku olîmpiyatên 2000'î li Stenbolê çêbibin"

Ji bo listikên olîmpiyata yên sala 2000'î, 5 bajaran xwest malxweyiye bikin. Ji wan bajaran yek jî Stenbol bû. Ji bona ku Komîta Navnetewî ya Olîmpiyata vê şerefê nede Tirkîyê ku ne layiqê vê yekê ye, Komîta Ewrûpayê ya YEKBÛN (Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê) ji KNO (Komîta Netewî ya Olîmpiyata) yên 181 welatan re şand.

Di namê de li ser terora dewletê, zulm û zordariya li ser gelê Kurd tî rawestan: "Armanca olîmpiyata ev e ku di navbera dîn, nijad û gelan de aşitî û dostaniyê xwirtir bike. Ji ber vê yekê jî hertim wexta bajarê ku wê olîmpiyatê lê çêbibin tî dest nîşan kirin ev prensîpên olîmpiyatê hertim li ber çav hatine girtin. Bi ya me jî van bajarên nûner, bajarê Îstanbûl, li dijî prensîpê aşitî û birayetiya di nav gelan de ye. Em nikarin bajarê Îstanbûl jî Tirkîyê cuda bikin. Wêk temama raya cîhanê şahid e ku Tirkî îşgalkirina Qibrîsê da xwiyakirin ku dewleteke îşgalker e. Emê bi çend rêzan jî we re diyar bikin ku dewleta Tirk polîtîkake çend hovane li hember gelê Kurd dimeşîne. Daxwaza me ev e ku hûn berî bajarê ku wê olîmpiyatê sala 2000 î lê çêbibe, helbijêrin, van rastiya jî bigrin ber çavê xwe.

YEKBÛN nama xwe bi van rêzan dawî tîne: "Dewleta Tirk bi gelek hêla hewl dide ku vî ruyê xwe yê barbarî bide veşartin. Lewra di kafîleya xwe ya olîmpiyatê de sala 2000'î de cih daye serokên dîni yê Ermenî û Asûriyan da ku bide xwiya kirin li Tirkîyê biratî û wekhevîya netewa û dîni heye. Lê ew nikarin ruyê xwe veşêrin û kesî bixapînin. Ne cih girtina kesekî Kurd ku bêje ez Kurd im, di kafîleyeke 200 kesî îspata herî vekirî ye. Ev rastiya ha di eslê xwe de ji bona hiwiyeta Ermenî û Asûriyan jî wiha ye". Roja 23'ê Îlonê hilbijartin çêbû. Stenbol bi 7 dangan hindiktirîn deng girt. Sydney bi 45 dangan bû mehzûbanê listikên Olîmpiyata yê sala 2000'î.

## Parlamenteriya Işıklar hat cemidandin

Piştî ku Mahkema Qanûna Esasî biryara girtina Partiya Ked a Gel (HEP) da, parlamenteriya Fehmî Işıklar jî jê hat wergirtin. Li gor vî biryarê Heyeta Şêwirdar ya Meclîsa Tirkîyê roja 15'ê Îlonê biryar da ku heta rewş zelal bibe, parlamenteriya Fehmî Işıklar bê cemidandin.

Fehmî Işıklar ji ber ku serokatîya HEP'ê kiribû, HEP jî wek partîyê Kurd dihat dîtin, ev biryar hat girtin.

## Sînorên Kurdistanê tî asê kirin

Wezareta Parastinê ya Tirkîyê butçeyê 4 trilyonî ji bo asêkirina sînorên Kurdistanê veqetand.

Li gor nûçeya ku di rojname de derketiye heta sala 1995'an wê 4 trilyon pere jo bo asêkirina "sînorên" Îran, Iraq û Sûriyê bê mesrefkirin. Bi vî butçeyê wê "sînorên" Tirkîyê bi tîlan bê perjan kirin, riyên şopê û yê kîşê bî çêkirin, bircên kontrolê bî ava kirin. Her weha hêzên Tirk yê li ser sînor wê bi dîrbînen şevê, panzer û projektorên elektrîkê bî çêkirin.

## NEYNIK

Wergera ji Swêdî: Zîwer Haco

## CÎNAYETÊN LI DIJÎ MIROVAHIYÊ

Yek jî stûnên bîngeha demokrasiyê li Rojava û li dinyayê, a-zadiya çapemeniyê ye. Eger mirov haydar be, gelek caran mirov di çapemeniya Rojava de pîrgî nivîsarên rexnegir dibe. Nivîsarên ku bi çavêkî rexnegir li siyaseta derve ya welatên xwe dinêrin û hêviya guherîna awira gelemperî ya gelên xwe dikin.

Ji bo giringiya tîgehîştina siyaseta aborî ya welatên Rojava li hemberî welatên Cîhana Sêyem, min girîng dît, hin noteyên ji rapora SIDA, ya bi navê "Riya Rizgariya ji Davika Deyndariyê", girtine, bidim diyarkirin.

"Dev ji Afrîqayê berdin" li ser navê zanyarên Afrîqayê, Femî Alkomolatê, di rojnama "New African" de dinivîse. "Afrîqa serxwebûn û serdestiya xwe li ser konevaniya aboriya xwe wenda kiriye. Bernameyên me yê pêşvebirinê bi destên bisporên Fonda Peran û Banka Cîhanê tî nivîsandin û pêk anîn. Ew ne bi tenê biryara li Afrîqayê dê çî were çandin didin, lê dê çawa pere jî bî bikaranîn" "...piştî dema kolonyalîzmê û sazûna dewletên serbixwe, tu tiştî weke krîza deyndariyê piştî welatên Afrîqa yê belengaz xûz nekîr. Ji 1982'an ve welatek di pey yekî re bê çare dikeve."

"...Bisporên Banka Cîhanê û siyasatmedarên Rojava ji wan re weke çare û derman, guherîna struktûrê û reformên aborî û siyaseta Şidandina Kemberê (yanî zêdekirina dervefiroşiyê û kêmkirina salix didin. Carna jî li gor dem û hoyan şîretên weke demokratbûn, kêmkirina mesrefa leşkerî li wan dikirin. Rast e, ev şîret û daxwaz baş bûn û di cî de bûn, lê dîsa jî tîra xelasiya welatên wan jî tîkçûn û tehlûkê nedikirin."

"Ev şîret û çare bêencam mane. Ev deh salên krîzê ne û her ku diçe rewş xerabtir dibe û tu pêşketin xuya nake. Deyn zêde bûne. Xwestina deynan kiriye ku deyndar derve firoşiyê zêdetir bikin. Vê jî hiştiye ku hevrikiya li ser bazaran zêdetir bibe. Helbet gava ku hevriki zêde dibe, buhayê mal jî dikeve û kêmtir dibe. Li gor lêkolînan ji bo zêdekirina dervefiroşiyê û ji davika deynan azad bûne, bihayê dervefiroşiya malê wek çay û qahwê, nake jî %20 bihayê xwe yê berî krîza deyndariyê. Hatina dervefiroşiya 26 welatên Afrîqayê yê herî belengaz ya sala 1992'an nake 1/5 ji pîncyêkê hatina dervefiroşiya wan ya sala 1980'yî. Hewqas xwe eşandin û helwest, hemû jî bo azadiya ji krîza deyndariyê."

"...Tehdîda krîza deyndariyê li ser welatên Cîhana Siyem ne nû ye. Tiştê herî nû li gor lêkolînen Înstîtuya Navnetewî ya Amsterdamê ew e ku ev krîz êdî dewlemendiya welatên industrî jî tehdîd dike.

Dokumentên lêkolînê didin xuyakirin ku krîza deyndariyê rê ji guherandin û xerakirina xwezayê re, ji bazirganiya esrarê re, ji zehmetiyê aborî re, ji zêdebûna penaberan li welatên industrî re û bêistiqariya leşkerî û siyasî re vekiriye. Yanî bi hin gotinên din, ev krîz careke din bandora xwe li ser welatên industrî dihêle."

"...Heya niha dezgeha bi giranî li ser vî rewşê sekiniye û pêşniyar û çare afirandine, organa (NY) Netewên Yekbûyî UNICEF, e.

"...Di rapora xwe de ya bi navê "Serxwehatina Afrîqayê di salên 1990'an de" UNICEF eşkere dike, ku Afrîqa di salên navbera 1960-70'yî ber bi pêşveçûneke berbiçav ve diçû. Lê berguherandinê bi krîza deyndariyê re dest pê kir. Bi kurtî vî yekê kir ku salên 1980'yî saline wenda bin. Ji ber ku mirov:

- 1- Li ser Afrîqayê ferz kir dê çî were çandin û deranîn.
- 2- Siyaseta bazirganiya serbest ferz kir, vî jî rê li ber pêşveçûna senetê welatîni girt û ew herifand.
- 3- Berê hêza kar jî sektorên alîkariya civakî û mirovî guhert û da sektorên karên ji bo sivikkirina deynan.

Di ser van hemû kiryanan de jî hîn siyaseta reformên aborî nekariye xwe ji aloziyên bînketina butçe û enflasyonê yê ku hîn di serwiya berî deh salan de ne, xilas bike."

"...Li gor UNICEF çareyên rast ew in, ku mirov berê plan û bernameyên pêşvebirinê bide ferehkirina çandiniyên ku hatine rakirin, peydakirina industriyê ku jê re hêza kar tî xwestin, bihêzkirina sektorên civakî ji bo belavkirineke rewşa û baştir û peydakirina hoyên zêdetirbûna hatina millî."

"...Krîza deyndariyê ne hêzeke xwezayî ye. Du sebebên wê hene:

- a) Doza xwediyên deynan li deyndaran ku ji aliyekî ve deynên xwe bidin;
- b) Ji aliyekî din ve serdestiya wan li ser plankirina civata deyndaran in."

"...Eger mirov bala xwe bide herikandin û guhestina sermaye di navbera welatên dewlemend û deyndar de, baş zelal e ku pere ji welatên deyndar û belengaz herikîne yê dewlemend.

Eger mirov hemû perên ku bi rengê alîkariyê, deynên nû, sermaye razandîn, bikaranîna sermiyanê taybetî û hemû danehev û kampanyayên alîkariyê ku ji welatên industrî çûne welatên paşvemayî hesab bike, koma wan dike 927 milyar dolar. Di eynî wextê de welatê Cîhana Siyem bi tenê fayîza deynan û parek ji deynan 1345 milyar dolar li wan vegeandine.

## RAMANÊN RAMANWERAN

# Bavê Nazê û "Nivîskarên Nezan"

## Deham Abdulfetah

"Rexne...Berî her tiştî jî rexne...tiştêk di ser rexneyê re nîne, ji rexneya bi bîr û bawerî pê ve..."

(L. N. Tolstoy)

Di rojnameya "Armanç", hej-mara (136) an de, Bavê Nazê gotereke rengreneyî, bi sernameya "Nexweşiya payetiyê ji nezani tê" nivîsiye. Bavê Nazê di gotara xwe de, bi şeweyekî dûrî rewîştî tore-vanan, pêkenî û tinaziyan, bi çend nivîskarên Kurd kiriye. Ew bextreşên ku ketine ber nişana qerfbarîna Bavê Nazê ev in:

Ferat Cewherî, Mehmed Ūzun, Deham Abdulfetah û rêzimanzanekî nebinavkirî.

Bavê Nazê rewşa payetiyê ku ji nezaniyê tê, bi ser Kurd û wan nivîskarên Kurd de berdide. Çûnkî dema ku Kurdek, bi yê beranberî xwe re dipeyve, ji dêvla ku bibêje "hûn", dibêje "em". Ango, ji payetî, xwe mezin dike û yê beranberî xwe piçûk dike.

"Emez...". Li min negrin ku we wateya "emez" nenasî. Çûnkî ez bi xwe jî nema dizanim çî dinivîsim..!

Piştî ku min di gotara Bavê Nazê de ev gotin xwend: *..ji şûna ku Kurdên me bibêjin "hûn" dibêjin "em". Bi gotineke din, ew xwe mezin dikin û yên li hemberî xwe biçûk dikin...Lê gelo çima nuha nivîskar û helbestvanên me bi vê nexweşiyê dikevin?!*, min di dilê xwe de got: ji îro pê ve, divê ku ez her du bernavan "em-ez", bi hev re bi kar binim.

Ez dibêjim, belkî we nuha wateya (emez) nasî!

Ez nikarim berevaniya her du biraderan (Ferat Cewherî û Mehmed Ūzun) bikim; çûnkî her yek ji wan bi tena xwe, berevaniya (30) milyon kesên bêkes dike:

Firat Cewerî, bi tenahî "Nûdem" ê derdixîne. Digel ku Bavê Nazê xweş dizane jî, ku gelek partiyên Kurdî, bi tevaya hêz û derîşmên xwe ve, nikarin kevnedemekê jî, derxînin!

Mehmed Ūzun- tev kêmasiyên xwe jî-refîkek seranser ji pertûkxaneyê Kurdî jî vala û toz-girtî, bi romanên xwe zengîn kir û xemiland.

Sereta, ji "Tu" heta "Bîra qedêrê", zincîreke xelek-xelekî di bîra xwendevanên Kurd re derbas dike. Her xeleeke jê, mebesta ramanê Kurdewerî di derûn û hinavan de diçîne!

Lê ew mamosteyê nebinavkirî yî bextewer..(helbet bextewer e, ku Bavê Nazê navê wî jî bîr kiriye! Xwezî navê min jî jî bîrkiriba..!)

Her wekî ku em tev dizanin, pertûkxaneyê Kurdî-nemaze ya be-şê Kurmancî-gelekî xizan e. Tiştê ku heye jî, ne sergihayî ye.

Gelo bêyî lêgerîn û lêvekolîn, dê çawa tîr û zengîn bibe?!

Nêçîrvanê nêçîrvanan ew e, yê ku bikare çar çivîkan bi kevirêkî bixe. Di gotara xwe de, Bavê Nazê ew nêçîrvan bû. Çivîkê çaran jî, ez Xwedê jê standî, Deham Abdulfetah bûm:

*..Werin vê talanê! Mirovek bê tîrs dibêje ku karê min yekîtiya devokên Kurmancî ye! Gelo wê mamoste Deham çî bigota eger yekî bigota, ez ê kaniyên Kurdistanê hemûya bikim yek? Bi ya min bi kêmanî gerek ew di bin simbêlan re bikeniya û jê bipirsiya: Sebep?*

Berî her gotinê, pêwîst e ku bête zanîn, hevpeyvîna ku Bavê Nazê çêl wê dike, hevpeyvîneke devokî bû. Li ser kasetekê hatibû tomarkirin.

Paşê, xuşka me Novîn Harsan-spasiyên min jê re-li Swêdê, ew hevpeyvîn bi pênuşa xwe vala kiriye ser kaxezê.

Vêca, heger peyvekê cihê peyvekê girtibe, yan jî bêjeyek kême ketibe, bêjeyekê sînoren xwe derbas kiribe, bibûrin..!

Ji layekî dî jî, ez dixwazim bibêjim, yan Bavê Nazê hevpeyvîn hemû nexwendiyê, yan jî xwendiyê û tenegehîştîye?! Min di hevpeyvînê de daye xuyakirin ku mebesta min ji karê min, ew e ku ez bikaribim tiştêkî hêja di warê zaravkên nivîsînê-ne yên devokî-de pêk binim. Tiştêkî dîtir jî heye, pêdiviyê ku bête nasîn:

Karê ku nuha ez dikim û yê ku ez niyazmend im paşeroj bikim; ji vê baweriyê tî: Her wekî ku min di hevpeyvîna xwe de jî gotibû, zimanê Kurdî yê neteweyî-ji pihlewiyê û vir de- li ser çend zaravên sere par vedibe. Zaravê Kurmancî, Soranî, Zazî, Horamî û Lorî. Di bin siya her zaravêkî sere de jî, çend zaravkên piçûk tene xebitandin. Vêca heger her nivîskarek,-di warê Kurmancî de- bi zaravê bajarê xwe, yan herêma xwe binivîse, gelo dê paşeroj ziman û çandeya me çî be?! Yekîtiya gel, ji yekîtiya zimanê wî ye. Û yekîtiya zimên jî, ji yekîtiya zaravên wî ye. Lê va em bi zaravkên zaravan dinivîsin.

Ev zaravkên ku tijî peyvên perçiqî ne, mişt bêjeyên biyanî ne (Erebî, Farisî û Tirkî). Û..Dema ku yek ji me bibêje: Çira..?, zan-yarekî mîna Bavê Nazê, dê bi pêkenî û tinazî bibêje: (..Ma pêwîsta me bi vî îşî heye?! Mamoste ez ji te dipirsim: ma pêwîsta me bi yekîtiya devokên Kurmancî heye? Ji bilî vê tu wê çawa bikaribî yekî Kurdaxî bi Amûdkî bidî peyivandin?)

Hêj î ez li ser ya xwe me: Bavê Nazê hevpeyvîn hemû nexwendiyê. Eger xwendibe jî, li ber neketiyê, yan jî xwe li ber nexistiyê!

Heger ez di gumana xwe de şaş bim..heger..êdî ev çî pend û amojgarî ne:

*..Mamoste heyran, serê xwe neêşîne û dest ji wî karî berde, hem ewê ji bo rehetiya te ba be,hem wê ji bo zimanê me kêmezîyan be..".* Ji bo rehetiya min baş e herê!. Lê ji bo zimanê me kêmezîyan be, ez bawer nakim..! Ziyana mezin ew e ku Mehmed Ūzun bi zaravkê Sîwerekê romanên xwe binivîse û Abdurhman Mizûrî helbestên xwe bi zaravkê Dihokê binivîse û Bavê Nazê jî çîrok-romanên xwe bi zaravkê Amûdê binivîse..! Herê, ziyana ev e!

Bavê Nazê dipirse: *..Ji bilî vê tu wê çawa bikaribî yekî Kurdaxî bi Amûdkî bidî peyivandin?*

Berî çawaniyê, bawerî pêdivî ye, ku baweriyê me bi yekîtiya nivîsîna zaravê Kurmancî hebe, em ê bi sanahî karibin rêçikên karê xwe bipelînin! Careke dîtir jî ez hemim dikim, mebest, nivîsîna zaravkên Kurmancî ye, ne peyvîna devokî ye.

Da ku em binasin, çendî nivîsîna bi zimanê Kurdî (Kurmancî) yî zelal girîng e, em ê evan her dû nimuneyên kiryarî ji xwendevanan re berçav bikin:

1-Ji zaravkê Afrînê:  
Em dizanin ku li herêmên Maletiya, Mereş, Urfa, Kovanê û Afrînê bernavê bêhê (

"xwe", bi wateya bernavên kesî "wî, wê, wan", bi kar tînin.

Wekî:-Ez çûm gundê Rustem, Gundê xwe ava bû, zeytûnên xwe hebûn, mala xwe xweş bû.

Lê bernavê (xwe), li piraniya herêmên Kurdistanê, bi vî şeweyî bi kar tî:

-Ez çûm gundê Rustem. Gundê wî ava bû, zeytûnên wî hebûn, mala wî xweş bû.

Gelek caran babeta "xwe" yê, hatiye tevdan û şewazê nivîsîna wê hatiye gotûbêjkirin. Nuha nivîskarên Afrînê mîna nivîskarên "Amûdê", "xwe" yê bi kar tînin. Lê her wekî şeweyê xwe bi devokî lêv dikin.

2-Ji zaravkê Amûdê:  
Zaravkê Amûdê, yê devokê, bi dû rewşen sere, nêvnas (mumeyz) dibe:

a)-Bikaranîna bêjeyê biyanî (Erebî)  
b)-Kurtkirin û vacêkirina hindêk bêjeyên Kurdî.

Bo ronîkirina zaravkê Amûdî, qencîrîn nimûne, gotara Bavê Nazê ye. De ka em ê bi hev re, li gotarê hûr bibin, her du rewşên devokîya Amûdî tî de bipelînin:

a)-Bêjeyên biyanî, di gotara Bavê Nazê de ev in:

(resmî, halet, fam kirin, muna-sebet, halan, cîran, kerem bikin, sebeb, rehetî û "îş" bi tirkî)

Vêca heger em binasin ku 9 bêjeyên Erebî û bêjeyê Tirkî, di gotarekê tene de hatibin û gotarê jî, latîkek tenê ji rûpelekî Armançê girtibe, gelo di romanêkê dirêj de, çiqas bêjeyên biyan, dê bêne xebitandin?!

b)-Digel ku gotara Bavê Nazê ne dirêj e jî, lê bêjeyên ku bi şaşî li ser zimanan sivik bûne û bi şeweyekî gelêrî tene lêvîkirin, di gotarê de pir in:

1-(..bo kesê ji xwe mestir).

Bavê Nazê (mestir), bi wateya (mezintir), bi kar aniyê. Lê bêjeyê wateya (serxweştir) daye! Çûnkî, xurdebêja (pirtika) -tir- ji bo pa-yedariyê dighêje rewşên rengdêr:

-Sor+lîr=Sortir

-Mezin+tîr=mezintir

-(Mest)+tîr= (mest-tîr). Tipa (t) ji (mest), li gora rêzana denganiyê tete avêjtin, wek, ziman+nas= zimanas

-Kurt+tîr=Kurtir

-mest+tîr= (mestir)

## Stiriyên me

### Zinarê Xamo

#### WELATPERWERÎ

Bê guman pêşketina şûrê millî û hissên welatperweriyê li ba hemû ferdên civatekê bi qasî hev ne xurt in. Dereca zeifî û xurtiya van hissên li gel tesîra gelek faktorên din, girêdayî dereca şiyarbûna meriv a millî û siyasî ye.

Ji bo tespîtkirina dereca welatperweriya yekî emê pîvaneke çawa ji qenaet û hukmên xwe re bikin bingeh?

Tarîfeke umûmî ya welatperweriyê bi kurtî wiha ye:

— Kesê welatperwer ji gelê xwe û ji welatê xwe hez dike; başî û feydeya millet û welatê xwe di ser menfeet û kara xwe ya şexsî re digre. Ji bo refah û dilşadiya millet û pêşketina welatê xwe ji tu fedekariyê maddî û manewî xwe nade alî.

Li vir ez Kurdên li welatê didim alîkî, bes Kurdên li Ewrûpayê wek numûne digrim. Gelo şêl û praktîka me Kurdên li Ewrûpayê yên ku ji xwe re dibêjin şoreşger û welatperwer bi van pîvanên jorîn re tam li hev dikin ya na? Li gor van şert û pîvanan em kîjan wacibên xwe yên welatperweriyê bi cî tînin û kîjanan bi cî naynin? Gava pîrseke wiha ji me bê kirin, bi dilekî rehet emê kanîbin bibêjin ERÊ, wek Kurd, wek mirovên welatperwer tiştê ji destê me tê, em dikin..

Helbet gotin, nişan û nav otomatîkman ne meriv dike însanekî millî û ne jî ruh û hissên welatperweriyê li ba meriv xurt dike. Yanî mesele ne gotine, mesele kirine.

Di vî warî de numûna herî balkêş, wek mirovên siyasî şêla me ya li hember Dewleta Kurd a Federe ye. Em hemû bi çavên serê xwe dibînin ku dewletên dijminên gelê me çawa bi hemû îmkanên xwe dixebitin ku vî star û hêviya gelê me careke din pûç bikin, bifetîsin. Ji bo bidestxistina netîceyê wiha ne tenê jî alî eskerî û siyasî ve, lê jî alî ekonomîk ve jî gelê me xistine bin hesargeheke gelek mezin. Hêzên kolonyalist dixwazin bi vî riyê hukûmeta Kurd teslîm bigrin, gelê me dîsa tîxin bin nîrê koletiyê. Seddam heta nuha hemû dan û stendînan ticarî û petrol ji ser gelê me qut kiribûn. Lê nuha, ev jî serê du mehan û vir de ye ku îcar elektrîk jî ji ser herêma Behdînan qut kiriye, jîn li gel kiriye zîndan.

Erê îro em nikanin elektrîkê ji Seddam bistînin, lê em Kurd dikarin di tînga xwe de ji alî maddî ve alîkariyê bi gelê xwe re bikin. Bi ku qasî xuya ye em di vî warî de gelekî sist in, îhmalkar in. Ji xwe bêtir em hêviya alîkariyê ji dunyayê dikin.

Di çarê meha Çiriya Pêşîn de Dewleta Kurd a Federe saleke xwe temam dike. Piştî îlana hukûmeta Kurdistanê Başûr bi demekê li ser navê Parlamento û Hukûmeta Kurdistanê li gelek welatên Ewrûpayê hesabek vebûye. Min carê ji berpirsiyarekî hukûmetê yê li Swêdê pîrsî; min got gelo Kurdên li Swêdê dijîn, her meh çuqas alîkariyê dikin? Hevalê berpirsiyar got despêkê baş bû, lê nuha ne hêja ye ku meriv reqema wê bibêje. Bi qasî ku min fahm kir, alîkariya dibe, kiriyaya buroya hukûmetê jî dernaxe. Ku ez bawer dikim kiriyaya buroya hukûmetê ne zêdeyî pênc şes hezar kronên Swêdê ye. Û cardin ez bawer dikim ev rewşa ne tenê li Swêdê, lê li her derê pîr hindik wiha ye.

Li welatekî wekî Swêd ku li gor tî gotin zêdeyî deh hezar Kurd lê dijîn û piraniya wan jî mirovên siyasî ne, lê cardin jî her meh alîkariyê hêja ku kanibe ji derdekî re bibe derman nayê topkirin. Ma ev numûne ne li dijî nav, îdîal û armanca me ye? Ez dev ji hemû Kurdên li welatên Ewrûpa yên din dijîn, berdidim, hema deh hezar Kurdên li Swêdê her yek mehê sed kronî bide dike milyonek kron. Em dev ji deh hezaran berdî, bira ji deh hezaran sê hezar, bira du hezar kes bide. Dîsa mehê dike dused hezar. Îcar bifikire ku bi milyonan Kurd her meh alîkariyê wiha biçûk bikin, gelo wê meblaxekî çuqas mezin were meydandê. Û jê wêdetir jî meblaxê emê bidin pîr ne muhîm e, ya muhîm tîfîzî û hesasiyeta me ya millî û siyasî ye. Mehê hezar, sed ya jî deh kron, ev pîr ne muhîm e, ya muhîm her Kurdekî welatpewer li gor qeweta xwe alîkariya bi hukûmeta xwe re li ser xwe wek wezîfeyê, welatperweriyê bibîne; gava mehekê nede, divê wîjdanen rehet neke, xewa wî neyê.

Gava were axaftinê, em gotinên pîr mezin dikin, Kurdistaneke serbixwe, demokratîk û yekbûyî dixwazin, lê gava tî kirinê, piraniya me fedekarî û mesûliyetê ku bi vî îdîala me ya mezin re li hev bike, nişan nade. Heger em wek ferd, wek millet li ser vî mînwalê dom bikin, em kortika hustiyê xwe dibînin, lê zû bi zû dewleteke serbixwe nabînin.

Dibe ku serok û berpirsiyarên hukûmetê yên îro ne li gor dilê me bin, dibe ku rejîma îro kêfa me jê re neyê, lê divê ev yek cardin jî nebe sebeb ku em li dijî vî hukûmeta avabûyî rawestînin ya jî bi xurtî alîkariya wê nekin. Çimkî em dizanin ne ev rejîm û ne jî ev serokên ku îro hene wê ebedî bin; lê dewleta Kurd wê ebedî be..

Rast e, gelê me ne li Kurdistanê Iraqê tenê, li Kurdistanê Tirkiyê, Îranê û Sûriyê jî ji bo serxwebûna welatê xwe şerekî bêhempa dide. Li çiya û kolanên Kurdistanê Tirkiyê û Îranê her roj bi dehan keç û xortên Kurd ji bo rizgariya welatê xwe xwîna xwe dirijînin. Zîndan li Sûriyê kesên welatperwer in. Helbet ji nav me gelek kes dostên van hêzan in jî, di vî çerçewê de divê ew berpirsiyariyên xwe yên rêxistinî jî bi cî binin. Lê belê divê berpirsiyariyên me yên siyasî re li ber wezîfe û mesûliyetên me yên millî negrin.

Tarîxê fersendeke biçûk daye me, divê em baş bizanibin ku "fersendên wiha tarîxî du caran nayên li deriyê meriv naxin".

Lêkolîn

# Li ser rapora Enstîtuya Kurdî ya Stembolê

## S. Rêving

Di rojnameya Azadî hejmara 68 (29 Tebax-4 Îlon) an de li ser problemên elfabeya Kurdî ya Latînî raporeke Enstîtuya Kurdî ya Stembolê hat weşandin. Çi ji vê raporê, çi jî ji hin nivîsên hejmarên 77, 80 yên rojnameya Welat xuya dibe ku di rojên 31'ê Tirmehê û 21'ê Tebaxa 1993, an de bi serperestîya Enstîtuya Kurdî û bi beşdariya nûnerên rojnameyan Nûbihar, Welat, Medya Guneşî û Feqe Huseyin Sagnîç û Torî, du civîn li ser elfabeyê hatine çêkirin û li ser daxwaza beşdarên, Enstîtuyê raporek amade kiriye.

Her çend pirsgrêkên elfabeyê li ser 7 bendan hatine parve kirin jî, ji raporê xuya ye, munaqesê zêdetir li ser şiklên tîpên î û î'yê bûne û beşdar bi piranî ji bona ku elfabe "hêsantir" bibe ghiştine encamê: divê şiklên tîpên î-î û î-î bîn guhertin û bikin wek î-î û î-î ya elfabeya Tirkî.

Ji bona vê dîtinê, di raporê de bi giştî sê sedem tên xuya kirin:

1- Celadet Bedirxan elfabeya xwe nêzî ya Tirkî kiriye: ...Celadet Bedirxan tu car jî bikaranîna elfabeya Tirkî nereziviyaye. Wî xwestiye ku elfabeya xwe nêzî ya Tirkî bike. Ma gelo tîpên wek "ç" û "ş" yê ji bilî elfabeya Tirkî di kîjan elfabeyê de hene? Celadet Bedirxan ne bi tenê carekê, gelek cara dibêje ku me xwe nêzî elfabeya Tirkî kir... (Felat Dilgeş, endamê Komîta Karger ya Enstîtuya Stembolê)

2- Klavyeya ku Celadet Bedirxan bi kar anî ya Frensîzî bû. Li gor Felat Dilgeş û Feqe Huseyin Sagnîç ...Pirsgrêk bi tevayî teknîkî bû. Ji ber ku Celadet Bedirxan klavyeya Fransîzî bi kar tanî... Û di vê klavyayê de jî şiklê tîpa î tunebû, rabû kumîkek danî ser î'yê.

3- Hêsankirina elfabeyê: ...Avêtina kumîk û bikaranîna î-î û î-î ya Tirkî de elfabeya Kurdî hêsantir bike û di xwendin û nivîsandinê de ji astengê rizgar bike... (Felat Dilgeş)...Îro çend kes dikare bi Kurdî meqaleyên binivîse? Ji bo ku gel bikaribe bi zimanê Kurdî bixwîne divê em hêsaniyan çêbikin... (Latîf Ozdemir, ji roj. Azadî)...Li gor min di elfabeya Kurdî de bikaranîna tîpên î û î ya Tirkî de elfabeya Kurdî hêsantir bike. ... (Zana Farqînî, ji roj. Welat)

### Mesela xwe nêzîkirina elfabeya Tirkî

Ji ber ku hem di çapemeniya Kurdî de pir kêr li ser hatîye peyivîn, hem jî di munaqeseyên li ser elfabeyê de -qasî ku min dîtîye- bi piranî tê piştguh xistin, yan bi awakî besît tîpên şirove krin, divê hîmên ku Celadet Bedirxan elfabeya xwe li ser ava kiriye, baş bîron kirin. Bê guman Celadet Bedirxan ji bona ku 'Kurmançên Tirkîyê' bi hêsaniyê bikaribin fêrî elfa-

beya Kurdî bibin û xwendin û nivîsandina bi Kurdî ji wan re hêsantir bibe, bi zanîn, elfabeya xwe danîne, elfabeya Kurdî nêzî ya Tirkî kiriye. Lê eger lê qasî ku sistema dengên di her du zimanan de rê daye û li gor guncîna hîmên din yên ku wî ji bo elfabeya xwe danîne, elfabeya Kurdî nêzî ya Tirkî kiriye. Lê eger mirov piçekî hûrgilî li ser dîtinên Celadet Bedirxan raweste wê bibîne ku ev nêzîkkirin ne weha rûnî û bere-layî bûye. Ji fikra çêkirina elfabeyê, heta şiklê dawî 14 sal derbas bûne. Di van çardeh salan de wî gelek cara elfabeya xwe guhertiye, li ser şiklên tîpan bi rewşên bîrên Kurd yên wê demê re munaqesê kirine; di vê qonaxê de hem şiklê tîpan, hem hejmara wan gelek cara hatine guhertin. Di sala 1919' an de Celadet Bedirxan ji 26 tîpên elfabeya Latînî û ji hin tîpên hevedudanî wek ch, ou, ai... ji 36 tîpan elfabeya xwe ya pêşîn çêdike. Lê tîpên hevedudanî davêje û şûna wan tîpên elfabeyên Yewnanî û Rûsî datîne. Di sala 1926' an de li Elmanyayê car din li elfabeya xwe vedigere, ji ber ku tîpên Yewnanî û Rûsî yekrengiya elfabeyê xira dikin, wan jî elfabeyê derdixe û li gor wî "du herfên ku ji me re ne gerek bûn" yek-car davêje û "hin herfên Latînî bilindek li wan bar dike û bi vî awayî elfabeyê ji 34 herfan û yekreng" tîpê pê. (Hawar. Hej.23. rûp. 1,2) Celadet bedirxan nabêje kengê 3 tîpên din ji elfabeya xwe avêtin û elfabeya Kurdî ya îro ji 31 tîpan pêk hat. Lê tê zanîn ku guhertina dawî di 1933' an de çêbûye ('k' bûye 'q' û 'q' bûye 'k'). Di vê qonaxê de Celadet Bedirxan yek bi yek hem li ser "dengên bingehî" yên di zimanê Kurdî de, hem jî li ser şiklên tîpan demekî dîr û dirêj xebitiye, li gor fonetîkbûna elfabeyê û li gor hîmên elfabeya xwe û ji ya hemûyê girangirtir li gor sistema dengên zimanê Kurdî şikil (tîp) jî dangan re dest nîşan kirine. Lewra xwe nêzîkkirina elfabeya Tirkî li ba wî ne weha besît bûye ya ku beşdarên civînê ji bo guhertinê ji xwe re kirine palpişt. Ewî ne ku elfabeya Tirkî daniye ber xwe, hema 29 tîpên wê girtine û 2 tîpên din li ser zêde kirine û gotiye ya ye elfabeya Kurdî. Dema ku Celadet Bedirxan li ser hîmên elfabeya xwe dipeyive, -ku jî şes bendan pêk hatîye- weha dibêje: "Benda duyem: Her çend dibe, ew çend dengên herfên latînî ên adetî ko di zimanên din de nas in, di elfabeya Kurdî de hîlanîn û ne guhertin. Bi vî awayî Kurdî de bikaribin elfabeya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsaniyê fêrî bibin." (Hawar, hej. 2, rûp. 6,7). "...Ji aliyê şikil 17 tîp di elfabeya her zimanî de bi ferqîne kiçik yek in: b d f g h k l m n p r s t v w y z" (Hawar, hej.2, rûp. 7). Anku ev tîpên he ne yên elfabeya Tirkî, lê yên latînî ne. Ji bilî tîpên li jor -a - e - o - u - j - jî di hinek elfabeyan de kêr zêde wekî hev in. Li wir dimînin tîpên -ê - î - i - û - x - q - c - ç - ş. Tîpa - î - û - ş - ne tê de yên din tev bo

nimûne di elfabeya Frensî de (ne wek deng, lê wek şikil) hene û -ş - di elfabeya Romanî de heye, ne ku wek Felat Dilgeş dibêje ku -ç - û -ş - bi tenê di elfabeya Tirkî de hene. Ji tîpên li jor Celadet Bedirxan bi tenê sê tîp ç, ç, ş ji elfabeya Tirkî xistine elfabeya xwe. Û tê zanîn ku ev her sê tîp ne bi tenê ji aliyê şikil, lê ji aliyê deng ve jî di her du elfabeyan de yek in. Hem di Tirkî de, hem di Kurdî de cihderka wan yek e, telafuza wan yek e, şikilê wan yek e û her sê jî tîpên dengdar in. Yek ji yekê ne dirêjtir, ne jî kintir e. Lê di mesela -î - û -î -yê de ne weha ye. Ji aliyê deng ve tevî ku cihderka wan yek e jî lê î ya Kurdî dirêjtir e ji ya Tirkî. Di navbera î ya Kurdî û î ya Tirkî de ferqe mezintir heye. Ne eynî deng in, cihderka wan ne yek e. Diyar e, wek prensîp di mesela xwe nêzîkkirina elfabeya Tirkî de Celadet Bedirxan du xal dane ber xwe: 1- Sistema dengên di her du zimanan de, 2- Li gor sistema dengan, dengên ku cihderka wan yek e û dirêjbûn, yan kinbûna wan qasî hev in, wek şikil jî ya elfabeya Tirkî girtin. Li gor van xalan jî bi tenê sê tîp: ç, ç, ş ji elfabeya Tirkî girtine û xistine elfabeya xwe. Ji xwe jî gotinên wî bixwe jî mirov dikare bi hêsaniyê bigihe vî encamê. Dema ew qala hîmên elfabeya xwe û li ser nêzîkbûna elfabeya Tirkî dipeyive, weha dibêje: "Ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê Kurdî ne, di şikil û dengên herfan de herçend heye, xwe li elfabeya Tirkî nîzing xistin û jê dîr neketin..." (Hawar, hej.2, rûp. 6,7). Anku di destnîşankirina şikilê tîpan de xususiyeta dengên zimanê Kurdî di xwe nêzîkkirina elfabeya Tirkî de rola serekî heye. Tevî vî baweriya xwe jî Celadet Bedirxan dema li ser şiklê tîpên ê, î, û dipeyive, eşkere xuya dike ku ka çima ji dengê -î - ya Kurdî re nîşana -î - û ji dengê -i - ya Kurdî re nîşana -i - hilbijartine û ne tîpên -î - û -i - yên elfabeya Tirkî: "...e ê û i. Niho ev şes herf hene ko di pêşberê hev de du tofên di şiklê de nîzingî hev diînin pê. Em her çarên jêrin bigrin destê xwe û bi wan mijûl bibin: e - i - ê - î. ...Di destên me de tu herfên din nemabûn, û li gor destûreke me diviyabû em herfên hevedudanî emel nekin. Ji lewra ji bo na nîşankirina tofa paşin me ev ( ) nîşana he pejirand û navê wê kir bilindek. (Li vir divê ez parantezekê vekim û bibêjim ku Felat Dilgeş dibêje: Jixwe em di xebatên Celadet Bedirxan de rastî peyva 'bilindek'ê nayên. Ji vî gotuna Celadet Bedirxan xuya ye ku wî bixwe peyva 'bilindek', pêşkêşî ferhenga Kurdî kiriye.) Di elfabeya me de du karên wê hene: dengê dengêran diguherîne û bilind dide xwendin. Li gor destûrên me ên bingehî diviyabû em bê sebebeke zor ji elfabeya Tirkî dîr mekevin. Li hîre (li vir) di herfên (î) û (ê) de em ji ya wan dîr ketin. Tirk (î) ya kin bi (i) ke bê niqte nîşan dikin. Heke me jî welê bikira û (i) ya kin bi (i) yeke bêniqte (i) û ya drêj bi (i) ke adetî

nîşan bikira çêtir nedibû? No! Ji ber ku (i) ke bêniqte di nav herfên (u n m) û di pêş û paşîya hin herfan de tevî wan dibe û ji wan derxistina wê dikeve dijwariyê... Jî pê ve herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayîyên wan du zimanan cihê ne, isûlê dengêrên Kurdî bivê neve ji isûlê Tirkî dîr ketiye. (Hawar, hej. 10, rûp. 4, hej. 11, rûp. 5)

### Îddiaya klavyeya Frensîzî

Di munaqeseyên li ser elfabeya Kurdî de hinek caran mirov dibihîse ku îddia ku dibêje ji ber ku teknîk pêş neketibû û di destê Celadet Bedirxan de bi tenê klavyeya Frensîzî hebû, wî Tirkî bi dest wî nediket, lewra mecbûr ma ku (î) kumîkekê deyne ser -î -yê û dengê î jî bi nîşana (i) xuya bike.

Berî her tiştî divê bê gotin ku di klavyeya Frensîzî de nîşana -ş - jî tune ye. Eger di destê Celadet Bedirxan de bi tenê klavyeya Frensîzî hebû, wî herfa -ş - ji kû aniye? Ya din Celadet bedirxan bixwe li ser şiklên î û î'yê munaqesê kiriye, gotinên xwe diyar kirine. Li gor wî jî ber ku "dengayîyên wan du zimanan cihê ne, isûlê dengêrên Kurdî bivê neve ji isûlê Tirkî dîr ketiye".

Ya din piştî ku wî bixwe gotibe ku çima şiklên î û î'yê di elfabeya wî de weha ne, îcar mirov rabe ji ba xwe li ser navê wî bibêje ku mecbûr bû weha deyne, ji ber ku klavyeya Frensî bi tenê hebû, wê ev îddia buxtanek be, çûnkî ji xebatên wî xuya ye ku di warê elfabeyê de pir ciddî bûye û li ser her tîpekê argumentên xwe pêşkêş kirine.

### Hêsankirina Elfabeyê

Wek tê zanîn gava cara yekem Kurdî bakur dest bi nivîsandina bi elfabeya latînî kirin, yan jî ber nepeydabûna elfabeya Celadet Bedirxan, yan jî ji ber ku elfabeya Tirkî dihat nasîn û hingê hêsantir dihat ku li gor wê elfabeyê binivîsin. Di vê qonaxa pêşî de di hinek -jixwe kovar û pirtûkên ku di wê qonaxê de bi Kurdî hatine weşandin pir kêr in- kovar û pirtûkan de tîpên ê û x w î i hatine guhertin û di şiklê ê û g v i i de hatine nivîsandin. Îcar eger bi rastî jî ji ber ku Kurdî Kurdîstana bakur elfabeya Tirkî dinasin û dikarin bi Tirkî bixwînin û binivîsin, û ev zanîn jî pir hêsantir dike ku Kurdî hîni elfabeya Kurdî bibin û bêasteng bi Kurdî bixwînin û binivîsin, divê em elfabeya Tirkî deynin ber xwe, 29 tîpên wê elfabeyê bigrin û tîpên w, q lê zêde bikin. Hingê wê her Kurdî ku bikaribe bi Tirkî bixwîne û binivîsîne, wê bi hêsantir hîni elfabeya Kurdî jî bibe. Eger problem bi tenê î û î ye, ger heta cihekî hêsanbûneke kêr bi xwe re bîne jî, ne pêwîst e bîn guhertin. Ji ber ku kîjan çareya siyasî jî gelşa Kurd a li Kurdîstana Tirkî re bê dîtin jî -çi mafên kulturî, ziman û serxwebûna îdarî, çi

otonomî, çi federasyon û çi jî serbixwebûna kamil- wê li Kurdîstana zimanê Kurdî bibe zimanê resmî, zarok wê di xwendinaxaneyên destpêkî û yên pê re bi tenê bi Kurdî bixwînin û binivîsin, zimanê weşan çapemeniyê bi yekcarî bibe Kurdî û bêguman bere bere wê zimanê xwendina bilind jî bibe Kurdî, wekî ku îro li Kurdîstana başûr bi cih bûye. Wê nîşane nû rabibin ku bi tenê Kurdî hîni bibin û zimanê Tirkî jî wek her zimanekî din wek zimanê xerîb, hîni bibin.

Tecrubeya Kurdîstana Başûr li pêş çavên me ye. Îro nîşan hene ku ne bi axaftin, ne bi nivîsandinê bi Erebbî nizanin. Ma kî difikire ku li Kurdîstana Bakur zimanê Tirkî her û her wek zimanê resmî bimîne, yan di ber zimanê Kurdî re, zimanê Tirkî jî, du zimana bi hev re hîni zarokên me bike? Mesela î û î'yê ewqas mezin kirin, problem dîtin ne rast e. Divê em di destpêka her tiştî de bifikirin ku zimanê Kurdî zimanekî serbixwe ye. Elfabeya Kurdî ya zimanê Kurdî ye.

Î û î ne ewqas problema derdixin ku "gel nekaribe hîni xwendin û nivîsandinê bibe". Ew çî gel e ku nekaribe ji ber du tîpan hîni elfabeya xwe nebe? Tevî ku nûnerê Azadî Latîf Epozdemir dibêje: "...Divê heqê guhertinê ji bo Enstîtuyê hebe...Divê Enstîtuyê di van pirsan de berpirsiyar be", di esasê xwe de bi berfirehî cara yekem di weşan û pirtûkên TKSP'ê de î û î hatin bi kar anîn. Eger wan hevalan ji destpêkê ev tîp weha bi awayekî fireh bi kar neanibana wê îro ev mesela nebiba problem jî. Her weha Enstîtuya Parisê jî zû de ye tîpên î û î dinivîsîne, lê derûdorên rojnameyên Riya Azadî, Roja Nû her û her bi awayê î û î nivîsandinê, guh nedane dezgehên heylî. Û bêguman nivîhenek jî be, rastiyek di vî gotinê de heye: "Di dîroka insanîyetê de cara yekem e ku rêxistîneke siyasî xwedî alfabeke taybetî ye."

### Çend Têbînî:

1- Karbidestên Enstîtuyê gotine ku di warê elfabeyê de name ji rojnameya Armanc re û jî endamê redaksiyona wê M. Elî re jî hatîye şandin, lê her du aliyan jî tu name negirtine. Her weha di raporê de qala dîtinên kesên ku ji derve name şandine nehatîye kirin.

2- Feqe Huseyin Sagnîç dibêje ku ew "ji kumika li ser tîpa "î" yê fedî dike. Ji ber ku tîpên din yên ji aliyê şikil ve nêzî hev ç, ç, s, ş yek bi niqtik, yek jî şuntik in. Fedîkirina wî ne rast e, çûnkî mirov îşaretan jî dangan re datînin û di elfabeyên zimanan de gelek tîpên cihê hene.

3- Di raporê de hinek kesan qala "guhertina gramatikê" kirine. Lê ne dezgeh dikarin gramatikê biguherin û ne jî heqê wan heye. Dezgeh û zimanzan bi tenê qayîdên gramera zimanekî derdixin rûyê avê, ne ku qayîdên gramere jî zimanan re datînin.

4- Pir baş e ku civîna Enstîtuyê biryar li ser guhertinê nedaye. Ji ber ku rîya herî rast ew e ku tev aliyên xwedî gotin, hemû enstîtuyên Kurdî, nûnerên redaksiyonên kovar û rojnameyên xerû bi Kurdî, zimanzan û nûnerên yekîtiyên nivîskarên Kurdî bi hev re li ser guhertina biryaran bidin, hem rasttir e, hem jî bicihanîna biryarê hêsantir e.

# Çend Problemên Kurdên Sovyeta Berê

## Tajdîn Biroyêv

Di 14-15'ê Çileyê Pêşîn ya sala 1992'an de li Moskovayê bi navê "KURD: Aspektên Civakî û Etnoçandî" konferansêk hatibû çêkirin. Serokê giştî yê Navenda Çanda Kurdî ya Neteweyî li Moskovayê Tajdîn Biroyêv di konferansê de li ser rewşa Kurdên li ser erdê Sovyeta berê dijin, raporekê pêşkêşî konferansê dike. Em kurtiya wê raporê ji bo xwendevanên xwe diweşînin.

Kurdên ku li ser axa Yekîtiya Sovyetan dijiyan, di dawîya salên 1980'an de pê hesiyana ku di jiyana wan de guherîna mezin pêwîst in. Vê pêhesiyane hingê dest pê kir, dema ku xwefamdariya gelan a netewî li seranserê Sovyetê bilind bû; ji bo pêşxistina çanda netewî, firehkirina serbixwebûna herêmî komele hatin danîn. Divê bê gotin ku ev daxwaz ne tenê ya gelên ku li Sovyetan bê dewlet, yan bê otonomî bûn, lê xwefamdariya netewî di nav gelên xwedî dewlet û xwedî otonomî de jî bi carekê bilind bû. Dixwazim bibêjim ku carna weha dibû ku daxwazên filan, yan bêvan miletî ewqas ji yên gelên ku bi hev re dijiyan, dihatin cida kirin ku digihîşt mîletçîtiya bi hemû awayên xwe yên paşverû. Di vê prosesê de xirîngê çêbû û em jî bûn ziyankêşeke wê.

Divê em bidin zanîn ku gelê Kurd di vê geremolê de xwe ji ekstremîzmê bi dûr xist, bi aqilane pirsên netewî-çandî, çareserîna pirsên civakî, dasekinandina mafên gelê Kurd, yên ku piştî Şoreşa Oktoberê li komarên Pişqafqasê hatibûn bi dest xistin, danîn ber serkariya welêt. Wek hûn dizanin di salên '30 î de Kurdan gelek tişt winda kirin. Serbarê barê jî bi hezaran Kurd surgunî navçeyên Asya Navîn û Qazaxistanê bûn.

Ez bawer dikim ku hûn ê bi min re bin, ger ez bibêjim ku me pirsên xwe gelek berk danîne. Ya herî sereke tevlihev bûne. Gelek cara Kurdên li herêmekê nedizana yên li herêmên din çî û çawa daxwaz dikin. Kêmasî ne ew bû ku

maf nedihatî xwestin, lê Kurd bi hev re tifaq nebûn, tebiya wan a yekîtiyê ne pir zelal bû.

### Kurd li 10 Komaran dijin

Di qonaxa hilweşiyana Yekîtiya Sovyetan de rewşa gelê Kurd hîn xirabtir bû; Kurd li deh welatên serbixwe dijin.

Li gor hejmartina 1'ê Çileyê 1989' an li ser axa Sovyetistana berê 153.000 Kurd hebûn:

Li Rûsyayê 5.000

Li Ûkraynayê 401

Li Ûzbekistanê 1839

Li Qazaxistanê 25.418

Li Gurcistanê 33.327

Li Azerbêcanê 12.211 (Di vê jimarê de li Naxçîwanê 3127 Kurd)

Li Qirgizistanê 14.262

Li Tacîkistanê 61

Li Ermenistanê 56.028

Li Turkmenistanê 4385

Bê guman di van çar salên çûyî de ev hejmar gelek hatine guhartin û eger îro hejmartinek çêbibe wê rewş ne bi vî awayî be.

Ya pêşîn Ji ber ku ji ber sedemên cihê cihê hinek Kurdan ji karmendên hejmartinê re gotine "em ne Kurd in". Li hinek cihan jî li gor qanûnê hejmartina bineciya hatiye terikandin û şûna wê li pasaporta hatiye nêrîn. Ji xelkê nepirsîna ku ew çî mîlet e, yan xwe ji kîjan mîletî dihesibîne. Û wekî tê zanîn bi tenê qewmiyeta Kurdan di pesportê de nehatiye nivîsandin 'Kurd'. Carna hatiye nivîsandin ku "Qewmê wî Êzîdî ye" û carna jî nivîsandine "Qef-qazî", ji ber ku dê û bavên wan jî Qefqazê bûne.



Koma govendên gelêrî yên Kurdên Elegazê

### Disa penaberî

Ya duyem van salên dawiyê şer û tevliheviya di navbera mîletan de navekî nuh ji Kurdan re anî: Kurdên muhacir. Nuha bi tenê li parwelatên Krasnodarê û Stavrapolê, li Komara Adigejê de bi deh hezaran muhacirên Kurd hene. Û hiç mafekî wan tune. Wek mul-tecî nayên qebûl kirin, lewra jî pirsên kar, xwendina zaroka, alîkariya pîran nehatine safî kirin. Navenda me çiqas ji destê wê hat, alîkariya muhacirên Kurd kir, lê helbet dilopek e ji deryayê. Me ji Komisyona Hevalbendên Ewropayê alîkarî xwest, nameyek ji konsolose vê komîsyonê, Êmerson re şand. Wî bersiva namê daye û gotiye ku ji ber rewşa xirab ya Kurdên muhacir xemgîn e. Lê alîkarî neda. Em divê sipasiya serokatiya Şewra Mîleta ya Parlamentoya Rûsyayê dikin ku soz dane me wê ji bo xweşkirina rewşa Kurdên li Rûsyayê bixebitin.

Lê mixabin em bawer nakin ku muhaciriya gelê me yê pîrzêrandî weha zû bi dawî bê û problemên wan çareser bibin.

### Şerê Azerî û Ermeniyên û Laçîn

Ji her tiştî bêtir em li ber rewşa Kurdên li Azerbêcan û Ermenistanê dijin, dikevin. Em naxwazin şerê di navbera Azerî û Ermaniyan de şirove bikin, gunehkaran diyar bikin. Lê him li Ermenistanê, him li Azerbêcanê Kurd dijin û bêyî dilê xwe ketine nav vê konfliktê. Serma, birçîtî, kuştin, muhacirbûn, xanî û avahiyên kavilbûyî bûye para Kurdan. Her weha di nav leşkerên her du aliyên de jî Kurd hene û mixabin bi des-

tê hev tene kuştin.

Bê guman li vir yekser pîrsa Kurdistana bi navenda Laçînê tê bîra me. Li ser vê babetê me gelek cara bîr û baweriyên xwe gotine. Em dixwazin ku ew mafên di salên '30 î de ji Kurdan hatine stendin, careke din li wan bîr ve-gerandin. Lê em berk li dijî tev-bûna nav karê Kurdên Azerbêcanê ne. Riya ber bi dasekinandina otonomiyê divê bi riya diyalogên aştî be. Metodên bi riya zorê wê rewşê xirabtir bike. Em dixwazin him bi Azeriyan re, him bi Ermeniyên re bi aştî bijîn. Ermenistan jî bo Kurdan bûye welatê duyem. Kurdên ku di destpêka sedsalê de xwe ji gelkujiyê parastin, hatin li wir bi cî bûn. Lê li Azerbêcanê ev çend sedsal in Kurd û Azerî bi hev re dijin. Wê gunehkarî bûya eger van her du gelan berî hev bidana. Em daxwaz ji Azerbêcan û Ermenistanê dikin ku bi biratî li mese-la Kurdan binêrin. Pîrs ne tenê siyasî ye, lê her weha pîrsa wicdanê ye jî. Û divê hesab bê kirin ku li rex sînoren Azerbêcan û Ermenistanê 30 milyon Kurd dijin.

### Li komarên din

Li Gurcistanê jî rewşa Kurdan bi yekcarî sexttir bûye. Li vir jî Kurdên birîndar û kuştî yên şerê navxweyî hene. Em dizanin ku îro li Gurcistanê rêxistin û teyfayên cihê cihê bi hevdu re ketine qal û cengê. Em hevî dikin ku Kurdan nekişînin nav vî şerê hundurî. Em biratiyê dixwazin, ne dijminatîyê.

Jiyana Kurdên li Tacîkistan, Ûzbekistan û Qirgizistanê jî ne bê problem e. Tesîra şerê di navbera mîletên li Fêrgana û Oşê li ser her mîletî çêbû. Her weha tişteki

ne veşartî ye ku hin hêz hene ku dixwazin erdê bidin bi tenê bineci-yên kevin. Lê divê bê gotin jî ser-okatiya dewletên Qirgizistan û Ûzbekistanê piştigiriya hemû gelan dikin. Lê em dibihîsin ku carna Kurd û mîletên din pev diçin.

Ji ber sedemên objektîf -pîr-mîletî, erdê bi çapa xwe mezin- û polîtîkaya serokatiya dewleta Qazaxistanê, bi ya me rewşa Kurda ya herî baş li vir e. Lewra jî gelek Kurd ji cihên ku şer lê hene, bar dikin, diçin Qazaxistanê, yan Rûsyayê.

Bi kurtî rewşa mîletê me li komarên Sovyeta kevin bi vî awayî ye. Lê pîrsdanînen girîng yên gelê me îro disa hene ku divê em bi hev re xebatê bikin ku çareser bikin.

### Pîrsa dîn, eşîrtî

Berî her tiştî divê em pêsiya wan kesan bigrin yên ku dixwazin mesela dîn derxin plana pêşîn. Em Kurd in û kurdbûn ya sereke ye. Musilmantî û Êzîdîtî pîrsa duyem e. Dîn karê her kesî yê şexsî ye. Şexis dikare dîn biguhere, lê mîletîti ku tu, bavê te, bapîrê te, kalikê te jê ye, nayê guhertin. Ew netewê te ye, xwîna te ye û ji wî pîrozîr tişteke tune. Li kîjan mîletî dixwazin binêrin, di nav de dînen cihê cihê hene. Ango miletek e, lê çend dîn li nav hene. Hûn texmîn dikin ku wê çî bûbûya, eger ew mîlet bi dîne xwe bihata bi nav kirin? Divê em bibêjin ku hinek kes dixwazin Kurdên Êzîdî parî ser Kurdan û Êzîdiyan bikin. Dibêjin Xwedê giravî Êzîdî ne Kurd in, lê mileteki cihê ne. Em di wê baweriyê de ne ku ew dixwazin Kurdan ji bo listikên xwe yên polîtîk bikin



Li Komara Qazaxistanê Koma Kurda ya stran û leylana ya bi nav "Cahilî"

Lêkolîn

alet. Lê yekîtiya millet li ser esasê neteweyîtiyê û bêyî dînhebandinê prensîba me ya sereke ye.

Her weha îro dîrokê ji me re wek mîrat eşîrtî û qebîletî ji hiştiye. Em ê bikaribin çareyekê ji vê pîrsê re bibînin, eger em tevî nûnerên eşîreta rûnî û bi hev re li ser çareserkirina pîrsê bi-peyivin.

Me dest pê kiriye dibistaneke bedewîtiyê li Tîblîsê ji bo zarokên Kurda yê jîr fînanse bikin. Em dixwazin dokument û dest-nivîsarên li arşîvên Rûsyayê û berhemên zanyar û kurdzana çap bikin.

Gelek problemên din jî hene ku nayên gîro kirin. Yek ji wan xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî ye. Piraniya Kurdên me dizanin bi Kurdî bi-peyivin, lê mixabin xwendinê û bi taybetî jî nivîsandinê kêrmanî dizanin. Ev problem sal bi salê mezintir dibe û Kurd jî ziman û çanda xwe ya netewî tînin birin. Bi baweriya me divê komik bînin ava kirin ku li her derî zarokên me bikaribin fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bibin.

Di nav Kurdan de zanyar, nivîskar, wênekêş, sazband, karkirên şanoyê, doktor pir in. Lê dîsa jî pîrsa gihandina kadroyên cûr bi cûr ehemiyeteke mezin dixwaze. Me alîkariya lawên xwe kir ku li fakulteya amadekirinê de bixwînin. Lê mixabin ew rind hîn nebûn û lewra jî gişk neketin unîwersîteyê. Îsal me hinek pere veqetandîye ji bona ku heqê xwendina wan Kurdan bidin, yê ku lîdî îdarên xwendina bilind de dixwînin. Çi jî hebe, eger em musteqbelê gelê xwe bifikirin, divê em kadroyan bigihînin. Lê divê ez mukir bêm ku ji bo biserketina van karan hemûyan pere û rêxistinên xurt pêwîst in.

Banka Kurdî

Divê em bizanibin ku bê pere tiştêk nayê kirin. Rewşenbîrên me di destpêkê de em gunehkar dikirin ku em bi bazirganiyê mijûl dibin. Lê ne xema kesî bû ku pere wê ji kû bînin. Dewlet qurîşekê jî nade me. Me pere bi deyn xwest (salê %140) neda me, ji ber ku em mecbûr in di gerewa pere de milk bidin. Em bi bazirganiya mijûl bibin, yan na? Gelo em jî bazirganiyê dewlemend dibin? Lê binêrin, bi tenê ji bo kiriyaya avahiyê em her meh 90.000 rûbila didin. Înflasyon gihiştiye wê derecê ku mesrefa rojnameya me li ser me 100.000 rûbilî rûdine. Bi tenê ji bo kiriyaya salona temaşegêha wênekêşên Kurd me 100.000 rûbil dan.

Helbet me dikarîbû em banka xwe ya navnetewî saz bikin, wekî ku demêkê damezrevanên dewleta Îsrailê kirin. Eger welatîyên me yê li welatên dereke û yê dewlemend jî bo danîna bankayekê alîkariya me bikirana, ev dikarîbû bûbûya delîlê bicihanîna projeyên mezin.

Di dawîya axaftina xwe de ez dixwazim bibêjim ku bîngehê çareserkirina tev pîrsên me girêdayî hev girtin û yekîtiya me xwe bi xwe ye. Pir zelal e ku bi tenê yekîtiya Kurdan ya rind birêxistî û hevgirtî dikare li ser erdê Sovyetistana berê jî bo Kurdan bibe hêzeke hevîdar.

Ji deftera

Komela Malbata Bedirxaniyan

Malmîsanij

Malbata Bedirxaniyan di sedsala 19'an û 20'an a tarîxa Kurdistanê de xwedî ciyekî girîng e. Ji vê malbatê wek Osman Paşa, Husayn Kenan Paşa, Mîthet Bedirxan, 'Evdirehman Bedirhan, 'Evdirezaq Bedirxan, Kamil Bedirxan, Salih Bedirxan, Emîn Alî Bedirxan, Celadet Bedirxan û Kamran Bedirxan gelek kesên ku ji miletê Kurd re xizmet kirine derketine.

Bi taybetî piştî Şerê Cihanê yê Yekem, dema ku Împeratoriya Osmanî hêza xwe ya berê wînda kir, ji malbata Bedirxaniyan hin kes û hin welatparêzên din jibo pêkhatina dewleta Kurdistanê xebitîn. Van kesan hewl da ku ji dewletên xurt ên Avrûpî yê wê demê jî alîkarî bigrin.

Îro xebata van kesan, kêrmanî be jî tê zanîn. Lê wan bi xwe di vî warî de yan zêde tişt ne-nivîsandine yan jî nivîsîne lê nivîsên wan negihîştine me. Di vê nivîsê de ez dê behsa belgeyekê bikim ku di vî warî de îstisnayek e, loma jî belgeyê girîng e.

Di vê belgeyê de zebtnameyên (tutanak) hîjdeh civînên komela malbata Bedirxaniyan, bi Tirkîya Osmanî -bi herfên 'Erebî- hene. Ev zebtname di rûpelên pêşînên defterekê de hatine nivîsîn. Ez nizamim bi destê kê hatine nivîsîn lê eşkere ye ku ji beşdarên van civînan çend kesan nivîsandine. Ez dibêjim "çend kesan nivîsandine" jiber ku ji nivîsê tê fêm kirin ku çend kesên cihê ew nivîsandine.

Ji van nivîsan tê fêmkirin ku li ser pêşniyara Emîn Alî Bedirxanî, di Gulana 1336 [1920]'an de li Îstebolê, bi nihênî (illegal), komela malbata Bedirxaniyan hatiye damezrandin. Ji xwe ev zebtname, zebtnameyên civînên vê komeleyê




Yên rûniştî ji çepê ber bi rastê: 1- Emîn Alî Bedirxan, 2- Alî Şamîl Bedirxan, 3- Mîqdat Mîthet Bedirxan (Fotograf ji Konê Reş hatiye girtin.)

ne.

Di civînên pêşîn de li ser pîrsên Kurd û Kurdistanê jî hatiye sekinîn lê di civînên dawîn de zêdetir li ser pîrsên malbatê hatiye sekinîn.

Ez li vir zebtnameyên sê civînên pêşîn werdigerinim Kurmancî. Di wergerê de, ji "motamot" wergerandinê zêdetir min hewl da ku ez me'na metna Tirkî biparêzim.

Ev belge heval Mahmûd Lewendî dabû min, ez gelek sipasî wî dikim. Li gor gotina wî, wî ev jî Konê Reş (Selman Osman), Konê Reş jî ji rehmetî Rewşen Bedirxanê (jina Celadet Bedirxan) girtiye. Yanî bi saya van kesan ev belge ji windabûnê xelas bûye û



Ji çepê ber bi rastê: 1- Kamran Alî Bedirxan, 2-Sureyya Alî Bedirxan, 3- Celadet Alî Bedirxan (Fotograf ji Konê Reş hatiye girtin.)

piştî 73 salan digihîje xwendevanan.

CIVÎNA YEKEM

În 27 Gulan 1336 [1920]  
Piştî nîvro 3. 30

- Emîn Alî Beg serek
- Muhemmed Alî Beg endam
- Murad Remzî Beg endam
- Hesen Fewzî Beg endam
- Xelîl Ramî Beg endam
- 'Evdirehman Beg endam
- Celadet Alî Beg endam
- Kamran Alî Beg endam

1-Pêşniyara Emîn Alî Beg a jibo amadekirina bîngehên endametiya malbatî ya mutesanid a malbata Bedirxan Begî û jibo mijûlbûna bi meseleyên malbatê re, avabûna komeleyekê, bi yekdengî (bi ittîfaq) hat qebûlkirin.

2-Kesên amade, li ser destbikarkirina vê heyetê -ku wek damezrênerê Komeleyê ye- peyivîne û dest pê kirine li ser maddeyên jêrîn sekinîne.

3-Piştî ku ji Peymana Aştî ya Osmanî beşê Kurdistanê hat xwendin û [li ser] xerîteyê hat tetbîqkirin, li ser dayîna notayek bi Sefareta Îngilistanê -jibo protestokirina maddeya ku Cezîre ya Îbnî Omer [Cizîra Botan] ji Sûriyeyê re dihêle- hat peyivîn.

4-Herçiqas ku li ser bîngehên serlêdanê (murac'etê) û dayîna notayê yekdengî (ittîfaq-î ara) peyda bû jî, jibo berterefkirina endîşeyan û paşdehatina selameta fikir, ligel muxalefeta Murad Begî bi piraniya dangan (rayan) hat qebûlkirin da ku di civîna bê (dahatû) de li ser maddeyên Peymanê yê ku li dijî menfe'eta millî ne, bête sekinîn.

5-Civîn se'et di 6. 20'î de bi dawî hat.

îmze (1)

CIVÎNA DUWEM

În 4 Hezîran 1336 [1920]  
Piştî nîvro 2. 40

- Emîn Alî Beg serek
- Murad Remzî Beg endam
- Hesen Fewzî Beg endam
- Xelîl Ramî Beg endam
- 'Evdirehman Beg endam
- Celadet Alî Beg endam
- Kamran Alî Beg endam

1-Jibo ku Cezîreya Îbnî Omer tevî otonomiya Kurdistanê bibe yan jî ji niha ve tevî 'erdê bakurê Mûsilê -ya ku heqê piştî salekê tevî hukûmeta Kurdîstaneke serbixweyê bûyina wê hatiye tesdîqkirin- bibe û jibo di dema bê de ji 'eynî heqî îstîfadedikirina wê, musweddeya notaya ku Kamran Alî Begî nivîsandibû tevî îlaweyên (lahîqayên) tarîxî û îdarî yê derheqê Hukûmeta Cezîreyê de, hatin xwendin û bi yekdengî hatin qebûlkirin.

2-Qerar hat dayin ku 'Evdirehman û Celadet Alî Beg van nota û îlaweyan wergerînin Frensîzî.

3-Pêşniyara Emîn Alî Begî hat qebûlkirin da ku musweddeya wê notayê ji Sekreterê Giştî yê Mîsr Îstîklal Komîtesî (Komîteya Serxwebûnê a [li] Mîsrê) Sureyya Bedirxan Begî re bête şandin û Komîte jî notayekê bi vê naverokekê bide[berpîrsiyarên] Îngilistanê.

4-Emîn Alî Begî pêşniyar kir da ku heyeteke sê kesî ya jinan a ji xwişk, "yenge"(2) û keçên bira/keçên xwişk pêkhatî bi dengên îstîşarî di civînan de amade bibin.

## Çand û wêje

## ARTUR RIMBOUD



## Demsalek di dojhê de

Xwîneke pîs  
-II-

Ax! Xwezka hema li cihekî ji dîroka Fransayê bapîrne min hebûna! Lêbelê na, hîç!

Bo min eşkere ye ku ez herdem ji nijadeke nizim bûm. Ez şoreşê têngnagihê. Ku ne ji bo talanê be, ticarî nijada min serî hilnedaye: Mîna guran, li ser goştê berata ku neşyan wê bikujin.

Ez dîroka Fransayê tînim bîra xwe, Fransa keça nexurî ya kiniştê. Ez dê rabûma, wek gundiyeke, min dê serek li xaka pîroz bida! Di serê min de rêçine di destên Siwabî de hene û dîmenine ji Pîzantayê û çeperine ji Orşelîm. Ji nav hezar lîskên sihirbaziyane î pîs, pîrozkirina Meryem û dilovaniya ji bo ê xaçkirî, di nava min de şiyar dibin.

Gurrî, li ser guldankên şikestî û li ser qurincokan, li bin dîwarekî bi tavê kerîmî, ez runiştîme. Paşê, renga, wek şervanekî ças, min ê li çolistanê, li jêr şevên Elmanyayê konên xwe vegirtibûna.

Ax! Ev jî: Roja şemiyê li gel pîremêr û zarokan, li gorepaneke sor ji daristanê semageriyê dikim.

Ji vî zemînî dûrtir, ji Filehtiyê dûrtir, nayê bîra min. Ez dîtina xwe yî diwemîn, di vî rabirdûyê de kuta nakim. Lêbelê her gav bi tenha me, bê malbat, ma gelo ez bi çi zimanî dipeyivim? Ez tu carî xwe di rêbazên ÎSA de nabînim û ne jî di pend û şîretên maqûlan de -nûnerên ÎSA.

Ez di sedşalya bûrî de kî bûm? Min îro xwe dîtîye. Hîç tajî û derewîn neman û ne jî cengên bê ser û ber. Nijada nizim xwe rakîşandiyê ser her tiştî -Gel, wek ku dibêjin û aqil; netewe û zanist.

Ay... Ay! Zanist! Her tişt xist bin çengê xwe. Ji bo laş û giyan -Canfidayî, bijîşkî û felsefe hene- Derzî û dermanê pîrekan û stiranên gelêrî ên şayîkkirî. Lîskên mîran û lîskên ku qedexê dikirin! Cografîya û kosmografîya û mekanîk û kîmya!

Zanist, serbilindîya nû! Pêşveçûn. Cîhan ber bi pêş ve diçe, ma gelo çima nagere? Ev dîtina ya hejmara ye. Em ber bi giyan de diçin! Ev tiştêkî bêguman e. Tiştê ku ez dibêjim pêşzanî e. Ez tédighê, lê ji ber ku bêyî peyvîne pûtperestane ez nikarim hestên xwe derbibirim, lewra bêdengiyê çêtir dibînim.

★ ★ ★

Xwîna pûtperestiyane vedigere! Giyan nêzik e. Çima ÎSA alkariya min nake, çima serbilindî û azadiyê pêşkêşî giyanê min nake. Mixabin! Dema ÎNCİLÊ çû! ÎNCİL! ÎNCİL!

Ez bi hilf bendemana Xwedê dikim. Her û her ez ji nijadeke nizim im.

Ha va ez li ser perravên Armorkê me. De bila di êvarê de bajar ronî bibin. Roja min kuta bû, ez dê Ewrûpayê bi cî bihêlim. Dê bayê derwayê pişkên min bisoje, dê herêmên nenas çermê min biqemirînin.

Ku avjeniyê bikim, ku gîha biperçiqînim, ku nêçîrvaniyê bikim, ku bi taybetî cigaran bikêşim, ku meyên xurt û kevna ên wek mîtala şîrgermî bi ser qirika xwe dakim, -Mîna ku wan bapîrên giranbuha li hawirdora êgir dikirin. Û ez dê vegerim, bi endamine hesinewî, bi çermekî tarî, bi çavêkî torebûyî: ji ber serçavka min dê min ji nijadeke xurt bihejmêrin.

Ez dê bibim xwedî zêr: Ez dê bêkar û pir bêcîr bim. Pîrek guh didin wan kesên hov ên nexweş ên ku ji welatên germ dizivirin. Ez dê xwe li tevî karên siyasetê bikim. Ez dê rizgariya xwe qezenc bikim.

A nuha ez ricimkirî me. Welat min ditirsîne. Çêtirîn tişt xelmaşbûneke pir sermest li ser qûmê ye.

-dûmahîk heye-

## DERYA Û KESKESOR

## Nizar Agirî

Sibehê ez şiyar bûm çûm ku rûyê xwe bişom. Ez di salonê re derbas bûm, kes li wir tune bû. Aramiyeke giran xwe berdabû ser hundir. Salon vala bûbû. Min bang kir, kesî li min venegerand. Min lezand çûm odên din. Vala ne. Kes nîne. Ne diya min ne bavê min û ne xwişk û biraderên min û ne kes. Çûne ku?

Sawê ez girtim. Min li dor xwe nêrî, ez neçûm destşoyê, min rûyê xwe neşûst. Ez vegeyam oda xwe ku ez cilên xwe li xwe bikim. Cil ne li wir in, ode bi temamî vala ye. Hîç tişt nîne ji bilî nivînen ku ez di nav de razayî bûm... Bi lez min derî vekir, min li cadê nêrî. Tu kes nîne, tu tevger, tu deng tu his... Bêdengiyek mezin hertiştî pêça ye. Ez çûm mala cîranê me, min li derî xist, kesî bersiv neda, min carek din lê xist, du caran, sê caran bi hişkî, lê her kesî venegerand. Ez bi bazdan çûm malên din, min li deriyên xist, li pence- ran... Hîç bersiv. Tu kes nîne. Min bi tena pîjeme di cadê de bazda ez pêrgî tu kesekî nehatim.

Ez vegeyam malê derî vekirî bû. Gelo min ew vekirî hîştibû? Ez derbas bûm, pêleke lerza sar bi ser laşê min de hat û tirsê ez girtim. Ez tenê me, tik û tenê, rûtî tenê di vî malê de... Belkî di tarê de, belkî li bajêr tev... Hîç deng, ne ji dûr, ne ji nêzik, ne liv, ne hej ne pistepist, ne ken ne girî, ne stran ne hawar, ne dengê mezinan ne yê piçûkan, ne yê mirovan ne yê dewaran. Hîç kes, hîç tişt valahiyek bêsinor... Ez wek mêşek ku di konê pîrhevokê de asê bibe... Konek ji bêdengiyek kujende. Min awirek din li hundir gerand, ez derbasî odan bûm, min tenê pêjna lingê xwe yê xwas dibihîst. Ez rawestiyam min li dîwêr nêrî, min demjimêra dîwarî dît. Lê! Ne demjimêra me ye. Tîpên wê nînin gurmîna deqên wê sist, monoton in û bi her gurmînekê re talavên şewqek zirav derdikeve û tiştêkî wek hilmê bi jor de hildikişî. Min xwe ji bir kir û her min li demjimêrê mêze dikir, lê ji nişkêve ez li xwe şiyar bûm û sawê xwe da ser min û ez hejijam. Ez bi lez ber bi derî çûm û bi yek carê ez ji hundir derketim.

Ez daketim cadê û ez meşiyam. Şûnde min dest bi revê kir, tenê û pêxwas... Ez


di cadan de direviyam. Min tu kes nedidît, hemû mal bêdeng bûn, bajar wek goristanek mezin bû, derî û pencere tev girtî bûn. Min her baz dida û ez ditirsiyam ku hêzek xerîb min dikîşîne. Ez ber bi deryayê çûm. Di hundirê min de tirsê dilîst. Tirs û arzûya naskirina vê guhertina ecêb ku bi serê dinyayê hatibû... Min baz dida û min dengê nefeskêşa xwe dibihîst. Tu kes tu tişt li pêşiya min der

dew. Ez li ser qûma beravê meşiyam, tevîzînek xweş di rehê lingên min re derbas dibû. Ez pê dihesiyam ku destên nerm, tenik, di ser lingên min re diçûn û tîr û min ber bi binê deryayê dikîşînin. Av digiha çokên min. Çi avek xweş! Avê dest pê kir li hawîr min dîlan dikir û masiyên rengîn û qeşeng di bin avê re li dora min dişemitîn û diçûn û dihatin.

Min xwest her ez bimeşim û bidim nav avê. Avê ez dorpêç dikirim. Ez di topan- dim, xelekên avê xwe li min digêrandin û xwe li dor min dizivirandin. Avê ez himbêz dikirim, laşê min di bin akamiyek nenas de ber bi avê diçû. Hêzekî veşartî ez dikîşandim. Dilê min didiqdiqand, wek qîzek xweşik ku destên xwe ji min re veke û min ber bi sînga xwe bikîşîne. Ez her diçûm û diçûm. Min nedixwest ez vegeyam. Ez pê dihesiyam ku ez diçim binê avê, lê min li ber xwe nedida nedikir ku ez zora avê bibim. Di wê dema ku av hat bide ser min, min dengî bihîstin, min hemû hêza xwe civand û ez zivirîm. Lê min kes nedît xuşînek bi dor min ket û zîwziw belav bû. Dengê diya min bi pêl belav dibû û ban min dikir. Deng ji jor dihat min serê xwe radikir, ezman tijî dar, teyr û gul û reng û şînahî bû. Rûyê diya min ji nav keskesorekê derket, lêvên xwe hur vekirin û got

-Kurê min ha ji xwe hebe!

Min devê xwe vekir ku ez bang wê bikim, lê avê girt ser min û dengê min xeniqand û ez hêdî hêdî çûm binî.



nediket, ez gîham qiraxa deryayê. Ev der jî vikîvala bû, xalî bû, aram bû, ne leqîn, ne pêl. Ava deryayê şîr û xurû bû. Şîniyek balkêş û be-

## KÎNGÊ HÊJAYÎ TE ME

Kîngê di dilê jînê de,  
Min tu kir pêlek evîne,  
Di çavên cîhanê de,  
Min tu kir gulbiharek.  
Kîngê di gewriya azadiyê de,  
Min tu kir stranek nemir,  
Di tîlên demê de,  
Min tu kir semfoniyek.  
Kîngê tiliyên stêran,  
Min ji te re kirin mûçink,  
Rûyê heyvê,  
Min ji te re kir neynikek.  
Kîngê bi hilm û bîna te,  
Min hestên mirovatiyê vejandin,  
Bi xewn û hêviyên te,  
Min eniya royê xemiland.  
Kînga min di lêvên şev û rojên xwe de,  
Navê te kir ramûsanek,  
Di ezmanê canê xwe de,  
Ala te kir keskeserok.  
Hîngê...  
Hêjayî te me.

Rûxweşê Zîvar



# Mehmet Uzun û çîroka dizîya "Tu"

Xwendevanekî bi navê Xalit Ferhad -tevî ku xwe li pişt devoka Behdîmî 'veşartîye' jî, ji zimanê wî xuya ye ku ji Kurdistanê Bakur e û çêtir bû ku xwe vekirî bidaya nasîn- li ser wekhevîya beşîna romana Mehmet Uzun TU û hin nivîsarên kovara HAWAR û pirtûkên Kamûran Bedirxan, Nûretîn Zaza, Zinnar Silopî, Ihsan Nûrî Paşa belgenameyek ji hin rojnameyên Kurdî re şandibû. Kurdên ku piştî çapa TU' yê li Swêdê bûn, dizanin ku di hinek civîn û suhbet û peyvên rojane de li ser dizîya ku di vê romanê de hatiye kirin, bi devkî gelek tişt hatin gotin. Lê, tevî ku di ser çapkirina TU re demekî dirêj jî derbas bûye, heta îro di çapemeniya Kurdî de tiştek li ser vê babetê nehatiye nivîsin. Bi hênceta belgenameya Xalit Ferhad, em car din li babetê veşartîyan û me beşên ku M. Uzun ji HAWAR û pirtûkên rewşenbîrên Kurd wek Kamûran Bedirxan, Nûretîn Zaza û Zinnar Silopî û Ihsan Nûrî Paşa wergirtine û bêyî guhertin xistine romana xwe, derxistin.

Bê guman çî nivîskar û çî xwendevanên ku hay ji dîroka edebiyatê hene, hay ji "wergirtin", yan dizîya di edebiyatê de jî hene. Nebûna qabîliyeta nivîsînê, daxwaza binavûdengbûneke hêsan weha dike ku kesek destê xwe dirêjî berhemên kesine din bike. Eger sawa rexnegir û xwendevanên jî tunebe, êdî karê kesê ku "werdigire" pir hêsanîr dibe. Dema ku nivîskarekê ked û xwêdan û westana giyanî ya nivîskarekî din 'wergire' hebûna xwendevan û xwediyê rastîyê yê nivîsê jî holê radike, anku her du alîyan jî bêrûmet dike. Çûnkî eger sawa xwendevan hebe, eger nîrx û buhayê xwediyê rastîyê (çî sax, çî mirî) hebe, "wergirtin" nabe.

Li jêr em listeya nivîsên ku Mehmet Uzun bêyî guhertin (yan jî kêmguhertin) ji Hawar, Ronahî û pirtûkên din wergirtine û xistine romana TU diweşînin. Ji ber nebûna çî me nimûnena jî vê listeyê hilbijartine.

## ARMANÇ

Listeya rûpelên ku M. Uzun ji Hawar û Ronahîyê girtine û di romana xwe de bi kar anîne ev e:

Tu, r. 16.....Hawar, no: 24, r. 5  
 Tu, r. 17.....Hawar, no: 25, r. 6  
 Tu, r. 23.....Hawar, no: 28, r. 3  
 Tu, r. 24.....Hawar, no: 28, r. 3  
 Tu, r. 25.....Hawar, no: 31, r. 3  
 Tu, r. 44.....Hawar, no: 24, r. 1  
 Tu, r. 45.....Hawar, no: 24, r. 1  
 Tu, r. 94.....Hawar, no: 25, r. 15  
 Tu, r. 141.....Hawar, no: 25, r. 4  
 Tu, r. 142.....Hawar, no: 25, r. 4  
 Tu, r. 144.....Ronahî, no: 28, r. 17  
 Tu, r. 152.....Hawar, no: 34, r. 6  
 Tu, r. 166.....Hawar, no: 34, r. 12

Tu, r. 167.....Hawar, no: 53, r. 8  
 Tu, r. 167.....Hawar, no: 34, r. 12  
 Tu, r. 170.....Hawar, no: 34, r. 5 (nota binî)  
 Tu, r. 170.....Hawar, no: 34, r. 8  
 Tu, r. 171.....Hawar, no: 34, r. 11  
 Tu, r. 171.....Hawar, no: 34, r. 5  
 Tu, r. 174.....Hawar, no: 53, r. 8  
 Tu, r. 199.....Hawar, no: 33, r. 14  
 Tu, r. 200.....Hawar, no: 33, r. 14

Her weha ji van berhemên jêrîn:

Tu, r. 23.....K. Bedirxan, Dersên Diyanetê û Hedîsên Cenabî Pêxember, Ji Tefsîra Quranê, Paris, 1971, r. 3, 5  
 Tu, r.64,N.Zaza, Destana Memê Alan,r.1  
 Tu, r. 103, Z. Silopî, Doza Kurdistan,r. 96

## ÇEND NIMÛNE

-1-

Tu, r. 17

"...Zarokno. Qulingan îsal ji me re xayintî kirin. Di vê zivistanê de zû pişt xwe dan çîyan û baranan, bamişt û sîpanan. Zû berê xwe dan deşt û berîyan. Çîma zarokno?....

Ev çî deng e zarokno? Ev çî heydedan e, çî guregur e li ezmana? Dengê nefir û zirna ezman e. Ne qiyamet e û ne jî axir zeman e....."

Hawar, no: 25 (1934), r. 6

"Lo qulingo, ez dibêjim tu bi cihê xwe xayin î, her zivistan tu pişt xwe didî çîyan û berfan û bamişt û sîpana. Berê xwe didî deşt û berîya û sefayê diki.....

Lo ev çî deng e û çî heydedan e û çî guregur e li ezmana? Dengê nefir û zirne û borizana. Hin dibêjin qiyamet e, hin dibêjin axirzeman e."

-2-

Tu, r. 23, 24

"Yê ku rastîyê nabêje û derewa dike û ne xwediyê gotîna xwe ye û jî emanet re xayintîyê dike, ew nimêja xwe bike, zekata xwe bide û here Hec û emrê jî, ew dîsa minafîq e.

Sipehîtiya mirovan, xweşîya zim-anê wan e.

Bihuşt di bin lingê diyan de ye. Dermanê nezaniyê pirs û xebat e. Pê zerer jî bigihê te, rastîyê bi-bêje. Paqijîya dil û laş nivê bawerîyê ye."

Hawar, no: 28 (1941), r. 3

"Yê ko rastîyê nabêje û derewa dike û ne xwediyê gotîna xwe ye û jî emanetê re xayintîyê dike, ew nimêja xwe bike, zekata xwe bide û here Hec û Emrê jî, ew dîsa minafîq e.

Sipehîtiya mirovan, xweşîya zim-anê wan e.

Buhest di bin lingê diyan de ye. Dermanê nezaniyê pirs û xebat e. Pê zerer jî bigihê te, rastîyê bi-bêje. Paqijîya dil û laş nivê bawerîyê ye."

-3-

Tu, r. 25

"Ji heft tiştên neqenç ku xelk pê diçin helakê, xwe biparêzin: ji mişrikiyê, ji sihirbazîyê, ji kuştîna xelkê bê rê, ji xwarîna malê sêwîyan û faîzê, di şer û qewimandî-nê de ji bazdanê, û ji kêmkirîna qe-drê jinên xwedî namûs û ji paşgotîniya wan..... Ji dinya we sê tişt bi min xweş in: pîrek, bihna xweş û mirovên nimêjker."

Hawar, no: 31, r. 3

"Ji heft tiştên neqenç ko xelk pê diçin helakê, xwe biparêzin: Ji mişrikiyê, ji sihirbazîyê, ji kuştîna xelkê bê rê, ji xwarîna malê sêwîyan û faîzê, di şer û qewimandî-nê de ji bazdanê, û ji kêmkirîna qe-drê jinên xwedî namûs û ji paşgotîniya wan..... Ji dinya we sê tişt bi min xweş in: pîrek, bihna xweş û mirovên nimêjker."

-4-

Tu, r. 44, 45

"...Deriyê derva yê malê mezin bû, ji darê berûyê pêhet çêbûbû. Deriyên din yê hundir, hemû ji darê gezûyê bûn. Dîwarên xaniyê we bi kevirên reş, û bi herîya kakirî ve hatibûn jenîn. Banê xênî jî heriyê bû. Di ser dîwarên re bi bihustek an bi du bihustan jî hev dûr, beştînen spîndaran dirêj kiribûn û bi mirdiya-qan ve neqeba beştan dagirtibûn û bi qasî piyekî ax berdabûn ser. Li havînê çaxa hûn ne diçûn zozanan, di bin temaşegaha ezmên de, we li stêrikan dinîherîn û li ser banê dinîvîyan. Bêî tu zimani, bi alîkariya li hevûdu nihêrîne ve, we derdên xwe yê sed salan, xweşiyên xwe

yên qayim û kêfxweşiyên xwe yê biçûk û rojê, ji dostên xwe re, ji stêrikan re digot. Dora banê xaniyê we bi diwarekî çarpê bilin ve girtî bû. Wê diwarê şûna sîngtaldekî digirt. Bapîrên te xanî wisan ava kiribûn, ku di dema şer û pevçûnan de, bila bi kêrê wan bihata, bila ji wan re bibûya asêgeyek."

Hawar, no: 24 (1934), r. 1

"Dîwarên xaniyan bi kerpiçên ko bi herîya kakirî têtê birin, lêdikin; bê tu dar û dep. Li şûna penceran di jorê dîwaran re qulan vedikin. Ev qulan ha bi tu tiştî ne girtî ne. Ji ber ko hatindîtina pîpok û kaxezê li wir hêj ne nas e.

Deriyê xaniyên xwe bi darê berûwê pihêt çêdikin. Di ser dîwaran re bi bihustek an bi du bihustan jî hev dûr, beştînen spîndaran drêj dîkin, û bi mirdiyaqan neqeba beştan dadigirin û axê berdidin ser. Qederê pêkî, pîyek û niv. Ev e banê xaniyên wan.

Li havînê, kurdmanç di ser van banan de dinivî, û piricar ev banên ha bi diwarekî çarpê bilind, dorgirtî ne. Ev dîwar şûna sîng-taldekê digirin. Xaniyên maqûlan jî di vî şiklî de ne. Tenê du tayên wan hene û carinan bi milekî wan ve burceke çarparsû bilind dibe.

Belê xanî bi her tiştên xwe welê hatine lêkirin ko di wextê şer û pevçûnan de bi kêrî wan bîn, ji wan re bibin sergeh û asêgeh."

-5-

Tu, r. 141-142

...Rojekê mirê Amedê, yanê Dîyarbekra îro, nêriyêkî pezkûvî kuşt. Xelk ji mezinahiya wî ecêbmayî man. Stîrihên wî pîvan, heft bihust derketin. Li ser vê yekê mirê Amedê got " Ez dê van stîrihan jî mirê Botan re bişînim, ka yê wisan di çiyayên Botan de hene". Ser vê yekê mirê rabû û stîrih jê re rêkirin. Miheme beg jî li wan ecebmayî ma.

Emrî neçîrvanan kir, ku herin nêrikî wisa bikujin, ku stîrihên wî jê mezintir bin. Neçîrvan bi çiyê ketin, çend rojan gerîyan, nêrikî wisan bi dest ne xistin. Efno û Hajale hebûn, ev herdu nêri li ber dilê mirê gelekî ezîz bûn, dilê wî gelek bi wan ve bû...

...Ji bona ku ji mirê Amedê re fehdîkar na be, da ber çavê xwe ku nêriyên xwe bi destên xwe bikuje. Bi xulam û neçîrvanan ve derket nêçîrê, çû raserî Dirba-Şkêr, di çepera Stûnê de rûnişt. Xulam û neçîrvanan pez xira kirin bi ser mir de anîn. Hejale di pêşîya pez de dihat, mir sê derb berdane, her sê derb jî lêketin, lê dîsan jî nêri ne ket û hat jî mir borî. Efno li dû pez bû. Mir bi derbekê Efno di cih de xist. Dilê mir gelekî pê ve ma. Wî li dora xwe fikir, çavên wî li xulamekî xwe Hesên ket, jê re got "Hesên carekê bavêje ser".

Hawar, no: 25, r. 4

...Rojekê mirê Amediyê -li gora gotinekê yê Hekkariyan- nêriyêkî pezkûvî kuşt. Xelk ji mezinahiya wî man ecêbmayî. Stîrihên wî pîvan, bi heft bihustan derketin. Mir got " Ez e van stîrihan jî mirê Botan re bişînim, ka ên holê di çiyayê Botan de hene". Ser vê yekê mirê rabû û sti-

ruh jê re rêkirin. Mihemed beg jî li wan ecebmayî ma. Emrî neçîrvanan kir ko herin nêrikî welê bikujin ko stîrihên wî jê mezintir bin. Neçîrvan bi çiyê ketin, çend rojan gerîyan, nêrikî welê bi dest ne ket. Efno û Hejale hebûn. Ev her du nêri ber dilê mir de gelek ezîz bûn; dilê wî gelek bi wan ve bû.

Lê ji bona ku ji mirê Amediyê re fehdîkar mebit da çavê xwe ko nêriyên xwe bi destê xwe bikuje. Bi xulam û neçîrvanan ve derket nêçîrê, çû raserî Dirba-Şkêr, di Çepera Stûnê de rûnişt. Xulam û neçîrvan pez xira kirin, bi ser mir de anîn. Hejale li pêşîya pez de dihat, mir sê tîving berdane, her sê derb lêketin, lê nêri bi xwe ne ket û jî mir daborî. Efno li dûvê pez de bû. Mir bi derbekê Efno cih de exist. Dilê mir gelek pê ve ma. Li dora xwe fedkirî, çavê wî li xulamekî xwe -Hesên- ket, jê re got: Hesên carekê bavêje ser.

-6-

Tu, r. 144

Axa me reş, ezmanê me tarî ye. Efrîtan pêşîya ronahiya me girtine, xorto, efrîtan. Em nikarin ji cixara xwe hilmekê rehet bikîşînin. Em difetîsin, dengê me dernakeve, dest û piyên me nalipetin. Dêw hatine li ser sînga me rûniştine.

Ronahî, no: 28 (1945), r. 17

Lawo tu dizanî çîra em hev nabînin. Çîra axa me reş; esmanê me tarî ye? Efrîtan pêşîya ronahiya girtiye. Lawo, tu dizanî çîra em nikarin hilmek rahet bikîşin. Em difetîsin, dengê me dernakeve, dest û pê me nalipe. Dêwî li ser sîngên me rûniştine.

-7-

Tu, r.152

"Carekê siltanê Osmanîyan, Mirê Botan dixwaze Stenbolê. Rîspîkî mir heye, ew jî pê re diçe. Dema digihên Stenbolê, rîspî jî mir re dibêje, "Ez benî, sibehê ez ê cilên te wergirim, bi-bim mir. Tu jî cilên min wergire bibe rîspî. Ma em ji ku dizanin ku siltan çîma banî te kiriyê? Ez ê herim ba dewletê. Heke siltan ez kuştim, tu vedigerî malê. Hingê cihê Botan bêserî namîne. Tu ê zaroyên min jî xwedî bikî. Û heke Siltan qencî bi min kir, jixwe ew qencî ji te re ye."

Mir tevdira Rîspiyê xwe dicibîne. Sibehê rîspî cilên mir wergire û diçe ba dewletê. Mir çend rojan li hevîya Rîspî dimîne, lê ew venagere. Mir ji hinekan dipirse. Yek jê re dibêje: "Tu here mala xwe, mir êdî venagere".

Mir vedigere mal û ji bona xizmeta rîspiyê xwe, banî kurê wî Elî dike û axatiya jêliyan û pênc-şeq gundên qenç jî, bi ax û av, didiyê.

Ji wê rojê pê ve ye, di navçeya Botan de cihêk heye, ku jê re dibêjin Cihê fitnan."

Hawar, no: 34, r. 6

Carekê siltan Mirê Botan xwestiye Stenbolê. Rîspîkî mir heye, ew jî pê re çûye. Wekê gihan Stenbolê, rîspî gote mir: -Ezbenî, sibehê ezê cilên te wergi-

rim, bibim mir. Tu jî cilên min wergire bibe rîspî. Ma em ji kû zarînan siltan çîre banî te kiriyê. Ezê herim ba dewletê. Heke siltan ez kuştim, tu vejerî mal. Cihê Botan namîne bêserî. Tuê zarowên min jî bi xwedî bikî. Û heke siltan qencî bi min kir, jî xwe ew qencî ji te re ye.

Mir tevdira Rîspiyê xwe eciband. Sibehî rîspî cilên mir wergirtin û çû ba dewletê. Mir çend rojan li hevîyê ma, rîspî venegeriya. Mir ji hinekan pirsî. Yekî gote mir: "Tu here mal, mir êdî venagere".

Mir vejeriya mal û ji bona xizmeta rîspiyê xwe ba kire kurê wî Elî û axatiya jêliyan da yê. Pênc şeq gundên qenç jî bi ax û av ve dan ê.....

Ji bona wî qasî navê vê zikakê bûye zikaka fitnê."

-8-

Tu, r. 166-167

Her celeb, her texlît dar hebûn. Darên bi ber, darên bêber, zirav, qalind, dirêj, kin, qayim û kevnar her babet hebûn. Darên qeysîyan, mişmişan, hirmîyan pir bûn. Bêî van, darên karçikan, xox, hilû, hejîr, hinar, sêv û tû jî çend celeb bûn. Hilûyê zer, hilûyê reş, hilûyê havînî. Hêjîrê tefarî, rijik, şingalî, bêhnatî, zerik, bêrkevanî, dirbî, bacanî û nizanîm çend celebên din. ...hinar jî, hinarê tîrş, şêrîn, rarişok bûn. Sêv, sêvê guhîjok, şekirî, xişxişok, xeylî û çermkirî bûn. ...bi hezaran darê tûyê hebûn. Tûyê reş, ezreqî, garisî, şemî hebûn....

...Ev hemû giyayên xwarbar in. Yanê tîn xwarinê, ..navê vê tolik e, ev giyayê kerengê ye, navê wan herduyan kariyê belek û kariyê kelehê ne, ev tûzmazk e, ev tolik, ev sor-yaz, ev sîrmak, ev sîrik, ev tîrşok, ev pûnk, ev selmik, ev rişwat, ev gulmêv, ev...wisan yek bi yek nîşanî min didan û navê wan digotin.

Hawar, no: 34 (1941), r. 12

"Di cihê jêliyan de her texlît darên bi ber û bê ber hene: Hirmê, karçîk, xox, hilû (çend texlît in: hilûyê zer, hilûyê reş, hevînî), qeysî, mijmî-jîk, hêjîr (çend texlît in: bêhnatî, şingalî, zerik, bêrkevanî, dirbî, bacanî, rijik, tefarî), bihok, hinar (çend texlît in: tîrş, şêrîn, rarişok), sêv (çend texlît in: guhîjok, şekirî, xişxişok), emerê reş, xeylî, çermkerî, tû (çend texlît in: reş, ezreqî, garisî, şemî)..."

"Giyayên xwarbar yanî, yê ko têne xwarin: Quzmaz, tolik, sor-yaz, sîrmok, sîrik, tîrşok, kereng, keng-zer, helîs, kidadîk, sêvbinerêdê, pariyê mihê, benik, gozerebik, spin-dîk, gulmêw, selmik, pûnk, kariyê belek, kariyê kelehê.

Giyayên nexwarbar û kulîlk: Giyareş, nefel, kelik, ket, çever, zirçîk, giyayê-keran, kelemper, karîş, firêz, sorik, nêrgîz, hendekû, bêrzan, hêro..."


-9-

Tu, r. 170

"Piraniya xaniyên wan şikeft bûn. Şikeft di rêza hev, di nav hevûdu de bûn. Şikeftên gundiyan pir spehî û xweşbergeh bûn. Di şikeftan de derî diçûn hev. Ji ber vê jî mirov ji serê gund heta biniya gund di şikeftan re dikare here."

Hawar, no:34, r. 8

"Piraniya xaniyên wan şikeft in. Şikeftên wan gelek spehî û xweşbergeh in. Di nav wan de şikeftên olî, yanî du tebeq hene. Di şikeftan de derî diçûn hev. Ji lewre mirov ji serê gund heta biniya gund di şikeftan re dikare here.





# Kovareke nû: HEVDEM

Di 23'ê Îlona 1993'an de li Tirkîyê bi navê "HEVDEM, Kovara Siyasî Çandî" bi hejmara xwe ya yekem ew jî ket nav refên kovar û rojnameyên Kurdî. Lê her bi derketina xwe re wê jî wek kovar û rojnameyên Kurdî nesîba xwe ji dewleta Tirk girt; Her di eynî rojê de ji alî DGM'ya Îstenbolê ve biryara berhevkirina wê derket.

Hevdem bi Kurdî û Tirkî ye. Xwedî: **M. Sıddık Taşdemir**, Berpirsiyar: **Ergün Gümgüm**. Hinek ji nivîsên wê ev in:

-Di Têkoşîna Netewî de Qonaxek Nû (Tirkî).

-Self Determinasyon û Tevgera Kurd a Netewî (Tirkî)- **B. Ayaz**

-Tevgera Siyasî ya Kurd Pêwîst e ku Xwe Nû Bike(Kurdî)-**Î. Güçlü**

-Tirkîyeya Piştî Özal û Xebatên Cephe (Tirkî)- **J. Rojdar**

-Li ser Kongra PDK ya Iraqê (Tirkî)- **Bavê Nûjîn**

-Pêvajoya "nu" (Kurdî)- **C. Batun**

-Hevpeyivînek bi serokê giştî yê Hevgirtin-PDK'ê **Hemreş Reşo** re (Tirkî).

-Ji bo çi kovar, ne rojname (Kurdî)- **B. Eser**

-Perspektîfên Tevgera Jina Kurd (Tirkî)- **F. Karahan**

-Mohra Terorîzmê, Têkoşîna Serxwebûna Gelê Kurd Dîfetîsîne (Kurdî)-


**B. Batté**

-Gelekî ku xwe ji nû ve nasdike:Kurd (Tirkî)- **Rohat**

-Di Qonaxa Netewîyetiyê de hêjayiyên netewî yên Kurd (Tirkî)- **S. Ferman**

**Ferman**

-Di dû sempozyoma aşitîyê re (Tirkî)- **R. Çakın**



## Dûmahîka nivîsan

### Filistînî bi hev ketin

Li ser navê PLO Mahmûd Abbas (Ebu Mezan) û li ser navê Îsraîl jî Wezîrê Derve yê Îsraîlê Şimon Peres protokola otonomiyê îmze kirin. Bêyî rêxistina Fetah hemû rêxistinên din yê Filistînî li dijî vê otonomiyê ne. Serokê Komutaniya Cepha Rizgariya Filistînê Ahmed Cibri jî bo ku Yaser Arafat bi Îsraîliyan re vê peymanê îmze kiriye, fermana kuştina wî derxist, Serokê Cepheya Demokratîk ya Rizgariya Filistîniya Naîf Hewatme roja îmzekirina peymanê bi hukûmeta

Îsraîlê re, ji bo Filistîniyan roja şînê îlan kir. Rêxistinên Filistînî ku li dijî vê peymanê ne piraniyên wan li Sûriyê bi cih bûne û ew dixwazin li hember alternatîfa PLO'yê rêxistineke din ava bikin. Li Îsraîlê jî Partiya Likûd û hin grûbên nasyonafîst li dijî vê peymanê derketin. Lê hukûmeta Îzhak Rabîn di Parlamentoya Îsraîlê de bi 61 dangan ev peyman tescîl kir. 50 parlementer jî li dij vê prosesê deng dan. Wek gelek dewletên cihanê dewletên ku Yekîtiya E-reban damezirandine jî pey-

mana di navbera Îsraîl û Filistîniyan de wek gaveke pozîfiv dîtin. Qiralê Urdunê Melîk Huseyîn bi Serokwezîrê Îsraîlê Îzhak Rabîn re rûnişt. Ev prosesa nuh ku di navbera Îsraîl û Filistîniyan de hat îmzekirin tenê destpêk e û îtîrafê hevdu-naskirina her du alîyan e. Lê tenê bi naskirina herdu terefan aşî nayê Rojhilata Navîn. Heta pîrsa gelê Filistînê û gelê Kurd bi adilane çareser nebe dê her gav Rojhilata Navîn fiçiya barûtê be.

### Cînayetên li dijî mirovahiyê


Înstîtuya Amsterdamê vê yekê dide ber tevahiya kilfeta plana Marşal ya ku bi qîmetê perên sala 1991'i digihîje 70 milyar dolaran. Bêje kêmîr ji deş salan de welatên dewlemend bi qasî şeş planên Marşal ji welatên belengaz stendine. "...Tiştên ku bi navê krîza deyndariyê tên kirin cinayetên li dijî mirovahiyê ne. Bi milyonan mirov dibin mehkûmên jiyanêke jar û belengaz û bêhêz." "...Gelên welatên îndustrî jî ku awayê tevgera hukûmetên xwe nadin sekînanandin, dibin şîrikên van cinayetên. Ew jî mirova-

hiya xwe didin bi halxweşiya xwe. Awîra pêwîst di vê demê de gerek wekî ya berî dused salî, ya dijî kolektîyê, be." "...Ji aliyekî din ve jî şîrikên cinayetê hikûmetên Cîhana Siyem in, yên ku li ser talankirina hevweletiyên xwe, xwe zengîn dikin. Çend ji wan ji hêla gel ve hatine hîlbijartin? Gelo ew dest ji xweşî û dewlemendiye berdîdî û jiyanêke rewî li welatên xwe peyda dikin? Gelo kes ji wan dikare îdîa bike ku nûneriya gel dike? Ji tiliyên destan ne bêhtir in!" "...Tu rê jî ji demokra-

siyê pê ve nînin. Rejîmek tu caran nikare bêhtir ji daxwaziya gelê xwe baştir bibe. Loma ji bo wekheviya mirovî gerek hemû derfet (aborî, qanûnî, zanyarî) ji hemû bindestan re werin dan. Bi tenê gava gelên Cîhana Siyem di rîya nûnerên xwe yên rast re biaxifin, dê hingê dengê wan were bihîstin û hurmet kirin. Dê hingê ji nûve dûzina dunyayê di navbera terefên wekhev de bibe pîrsa dan û stendîne û ne bi zora qamçiyên diktatoriya deynan were bi rêvebirin."

## Xaçepîrs

### Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1-a- Pêşnavê nivîskareke Kurd ku di sala 1909' an de li bajarê Kayserî yê Tirkîyê hatiye dinê. Malbata wê paşê çûye Şamê. Li Şamê bûye mamosta zimanê Erebi. Di sala 1957'an de wek nûnera Kurdan li Yewnanîstanê beşdarî konferansêkê bûye. Di sala 1935'an de bi Celadet Bedirxan re zewiciye. Paşnavê wê Bedirxan e. b- Di Kurmancî de veqetandekewandî 2-a-Di Kurmancî de veqetandekewandî ji bo peyvên nêr. b- Nivîskar û karîkaturîstê Kurd ku cara pêşîn bi navê Mîrkuî kovareke mîzahî, paşê bi Malmîsanîj re 2 cild li ser Rojnamegeriya Kurdî û vê dawiyê jî bi navê Mala Xwedê kitêbeke mîzahî derxistiyê. 3-a- Ji

navên qîzan b- Cihê teng yê ku erd ji her du alîyan ve cih li avê teng kiriye.(bervajî) 4-a- Kesê ku pir lezê dike, her tim bi ecele ye. 5-a- Têjikê hirçan b- hejmarek (bervajî) c- erdê bi av (bervajî) 6-a- Di muzîkê de notayek (bervajî) b- sîma, dem, wecih c- bi Soranî 'av' 7-a- Îlan, înfomasyon8-a- Di Kurmancî de daçekek (bervajî) b- Pronavek (bervajî) c- Behr, par. 9-a- Serab b- Ne binî 10-a- Mehkeme b- Şilatiya ku hormon di devê yekî de peyda dikin. 11-a- Cihê ku genim lê dihêrin. b- pronavek c- hetav, ro (bervajî) d- baneşanek (bervajî) 12-a- kok, ra b- paytextê Fransayê.

Serejêr: 1-a- Bexçê darên

mêwa b- wêran, xopan c- agir. 2-a- Paşnavê nivîskarekî Swêdî yê bi nav û deng ku navê wî Gunnar e b- paşdaçekek c- aletê ku mirov pê por şe dikin. 3-a- Vir (bervajî) b- Di alfabe ya Kurdî de tîpa sîhem û pêncem 4-a- Darê ji bo şewatê b- kur, xort. 5-a- Bi Soranî 'li' (bervajî) b- Ku tîpa 'o' têkeve navbera wan dibe peyva "gok". c- serbestî, hurîyet. 6-a- kurê kurê mirov, torin. b- lihevhatina, lihevquncîn. 7-a- Kesê ku ji bajarê Wanê be. b- Navê jina Hîtler. 8-a- Kûçik b- Karê xwazokî, destê xwe li ber xelkê vekirin. (bervajî) c- dîne dîn, dîne ne sekînî. 9-a- Du herfên wek hev. b- Miletê ku li Rûsyayê dijî. c- kesê avê dixwaze, têhnî. 10-a- Nivîsarên ku dikevin nav beşek ji beşên edebiyatê. b- Aletê biçûk yê ku li gunda jin pê hirî dirêsin (bervajî) 11-a- Derz, qelş (bervajî) b- vexwarina serekî (bervajî) ne di ber hev re, ne di nav hev de, ji hev dûr (bervajî) 12-a- Dumahîk, nihayet b- Jinên Kurd li hin deveran didin serên xwe (bervajî)

**Bersiva hejmara berê**

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
L	A	Z	A	R	E	V	E	P	E	D	
N	S	A	Z	E	K	A	V	A	D	E	
N	E	V	E	G	I	R	A	V	I	N	
A	=	A	R	C	I	S	I	V	I	O	
N	Ü	S	K	A	R	T	O	L			
Z	U	A	V	S	A	K					
S	A	R	A	G	D	L					
E	N	A	H	E	M	N	A	V	N		
V	N	Ü	S	Ü	M	I	R	I			
O	V	S	N	A	Z	A	R				
A	H	Ü	R	A	M	A	Z	D	A		
P	M	I	R	E	B	A	N	I			

### Bavê Nazê û "Nivîskarên Nezan..."

-Mest: Serxweş  
-Mestir: Serxweştir

2- (..Kesên li hemberî xwe bi karetereke din dinivîse dikin)  
"Biçûk": Bêjeveke gelêrî ye, bi devokî tete lêvkin. Ya rast biçûk e. Çûnkî ji (piç), bi wateya (hin, hûr..) e.  
Lê "biç" çi ye?!

3-(Gelo Wê mamoste Deham çi bigota?) Bavê Nazê (Wê), bi wateya xurdebêjên paşerojê (ê - dê), bi karaniye. Ev jî bêjeveke gelêrî ye. Hemû rêzimanzanên Kurd (R. Kurd, C. Bedirxan, K. Bedirxan û S. Şivan) hemin dikin ku (wê), bo paşerojê nayê xebitandin. Tenê Qenatê Kurdo û Feqî Huseyîn (wê) bi wateya (ê - dê) tênin.  
Di nêrîna min de, rastiya (wê) ev e:  
-(wê) ji bernavê kesîn (ew) û xurdebêja paşerojê (ê) pêk hatiye: (Ew+ê=ewê). Tîpa (e) ji (ewê) hatiye avêtin, bûye:(wê).  
Ev sivikbûna (ewê) ku bûye (wê), bernavên şanîdan di raweya verê de jî, dikevin ber: Ev+î=evî=vi  
-Ew+ê=ewê=wê  
Nedurîstiya (wê), bi wateya (ê-dê) jî evê ramanê tê: Ne durîst e ku navdêr û bernav bi hev re, di yek hevokê de bên. Wekî:

a)-Mamed wê biçê malê  
-Mamed (ew ê ) biçê malê  
b)-(Gelo wê mamoste çi bigota?)  
-(Gelo-ew ê-mamoste...?)  
Ya durîst ew e ku Bavê Nazê bigota:  
-(Gelo mamoste dê (ê) çi bigota?)  
4-(..Ji şûna bersivê ewê ji şerma sorgulî nebiba?. Lêkera (nebiba) gerek (nebûba) bihata.  
Ji ber ku jêdera (radera) lêkerê (bûn) e. Wekî (çûn):-(Gelo ew ê neçûba?)  
5-(Cîran): Ev bêje Ereban ji bêje Kurdî (cînar) vacî kirine û li gora taybetiya zimanê xwe pê xebitîne. Bêje, ji (cî+n+ar) pêk hatiye.  
Cî: bi wateya (war, cih, cîgeh..)  
N: tîpeke navbir e. Di-keve navbera du dengdêran û wan jî hev dibire ( tîpa kelijandinê ye)  
ar: xurdepaş (paşgir-paşpirtik)e. Dighêje navdêran, Ew û navdêr bi hev re wateya navdêrekî di didin.  
Wekî:-Cot+ar=cotar  
-Zeng+ar=zengar (zîngar)

6-(..Heya bi karakterekî din binivîse! nikarin bibêjin..)  
Gerek bêjeve "niha", "nuha" bihata gotin. Çûnkî

(nuha) ji (nû, nûh, nuh, nuho) hatiye. Lê (niha) ji çi hatiye?!

Piştî evê ronîkirinê, dixwazim ji dostê xwe Bavê Nazê bipirsim:  
-Di bextê te de be, heger ev hevok: (karê min ew e ku ez devoka Kurmancî bikim yek), jêrî wêneya min nehata nivîsîn, tu yê pêjna (yekîtiya devokê) ji hevpeyivîne bikra?!

Digel ku hevpeyvîn bi şeweyekî bê serûber hatiye nivîsîn jî, lê herî jê tete nasîn ku mebesta min, yekîtiya zaravkên nivîsînê ye, ne yekîtiya devokên gelêrî ye!

Li dûmahîya evê gotarê, pêwîst e ku em askere mukur bîn, ku payetî ne rewşeke şarîstanî û zanyarî ye. Û payetî bi mirovê çandewer û torevan nakeve. Herê ev rast e! Lê ya jê rastîr jî ew e ku pêkenî û tînazî jî bi zanyar û çandewaran nakevin.. Qerfên dirînek û kenê (binsimbêlan) nivîskarên rêzdar arzan dikin, rûmetê ji navbera hevkarên hîltînin!

Helbet, çi kesê ku kar bike, dê bikeve kêmasî û şaşîyan..tenê...miriyên mezelan tenê nakevin kêmasî û şaşîyan. Ew jî, ji ber ku karê wan xweke bê serhildan e...!

# Kultur û Qabiliyet

Riza Polat

## DÎROKNÎVÎSÎNA KURDAN WEK NANÊ KARTÛ ZUHA YE

Di nivîsandina diroka Kurdan de gelek valahî û alozî hene û nivîsînên tarîx û zanistîya dirokî sathî ye û çîrokî ye. Li welatekî heke her kes bikaribe li ser dirokê biaxive yan jî binivise ev yek delîlê nezanî, valahî û sathîbûna nivîsandina dirokê ye. Ji ber vê jî mirov dikare bi rehetî bêje, ku lêkolîn û nivîsînên di derheqê diroka Kurdan de hene belkî îro ne tiştên hewqas bikêrhatî ne ku mirov wan munaqêşe jî bike. Çunkî dema ku mirov li stardand û kirîterên dirokê, diroknasiyê û diroknivîsîna îro dinêre, mirov dibîne ku di vî warî de Kurdan hê jî dinivîsandina dirokê de girên biçûk jî durust nekirine. Her wiha berhemên li ser diroka Kurdan hatine nivîsîn ji aliyê ilmê dirokî ve pir qels in, yan jî vala ne.

Armanca ilmê tarîxê ew e ku jiyana dema bihurî, bi dokument û şirovekirin raxe ber çavan û wê bide fêmkirin ku mirov bikaribe rewşa xwe ya îroyîn têbigihije. Armanca tarîxê ne ew e ku tenê ji bo meraqa mirov a di derheqê tarîxê de tatmîn bike. Armanca ew e ku rêsmekî û tabloyekê di serê xwendevanan de di derheqê jiyana derbasbûyî de çêbike û wê jiyane bide fêmkirin, ku xwendevan bikaribin xwe û civaka ku tê de dijîna nas bikin. Nivîsandina dirokê pêwîst e bikaribe jiyana derbasbûyî ji mirov re ron bike, ku mirov bikaribe jiyana îro û a bihurî bide ber hev û jê encama derxe, ku cihê roja îroyîn bide nasînin.

Dîrok nikare bi dokumentên req û hişk bê nasînin. Lewra jî, dokument bi serê xwe wek hestiyê bê goşt e. Goşt û xwîna nivîsandina dirokê şirovekirin e. Cehwerê dirok û diroknivîsînê îzahkirin e û di nivîsînê de şirovekirin tiştêkî bîngehî ye. Ya ku maneyekê û fêmkirinekê dide tarîxê ev yek e.

Lê di nivîsandina diroka Kurdan de şirove û kûrbûn pir kême. Piraniya pirtûkên di derheqê diroka Kurdan de hatine nivîsandin bi standart û bi krîterên qirnê navîn hatine nivîsandin. Diroknivîsîna Kurdî hê jî xwe ji qonaxa diroknivîsîna qirnê navîn xelas nekiriye. Ji ber wan sedeman jî nivîsîna diroka Kurdan tu carî xwe ji nivîsîna kironolojîk yan ji nivîsîna hedîseyî xilas nekiriye. Loma jî heta nuha jî nivîsîna bi wî şeklî di rîya ronkirina pîrsgirêkên diroka Kurdan de çareyek nedîtîye.

Di naveroka pirtûk û nivîsandinên van salên dawiyê de ku Kurdan di derheqê tarîxa Kurdan de çap kirine, şirovekirineke ku mirov nûh û ciddî bihesibîne kême in. Piraniya pirtûkan wek tercumeyek yan jî kur-

tiyek ji kitêbên zimanên din hatine çapkirin. Serekaniyên agehdariyan çend pirtûkên ku wê dawiyê li ser tarîxa Kurdan hatine nivîsandin, ji çerçeweyê jî perspektîfa berhemên çend diroknas yan jî nivîskarên Tirk dermeketine. Di nivîsîna dirokê de belge û dokumentên destê yekem pir kême in. Bo nimûne ev rewş bi gelemperî ji bo Kurdên Tirkiyê yên ku di derheqê dirokê de dinivîsîn, eynî tişt e. Dokûmentên wan yên destên yekem kême in, piraniya belgeyên ku bi kar tinin yên destên du-yemîn in. Ji ber vê jî kitêbên ku tenê nivîsandin pir sathî ne û wek nanên kartû zuha ne. Ev berhem nikarin di serê xwendevanan de zanistîyêke dirokî çêbikin. Piraniya kitêbên ku hatine nivîsîn wek pêşkêşkirina dokûmentên komkirî ne. Melûmat û tezên nuh di van nivîsandinên dirokî de tunene. Berî hertîştî ev zemîna ku

berhemên bi naverok û bi perspektîvên nûh bifirîne di nivîsîna dirokê a Kurdan de durust nebûye. Di dema buhurî de li ser jiyana û diroka gelê Kurd pir kême hatiye nivîsandin. Piraniya kitêbên ku do li ser Kurdan hatine nivîsîn ji aliyê mîsyonerên biyanî hatine nivîsîn. Ev jî gelek tebiî ye ku wan bi kirîter û mîzanên xwe li meselê nihêrîne û anîne ziman.

Ji bona ku dagirtinek an jî zengîniyek di vî warî de çêbe, pêwîst e ev dokument û malzemên ku bi zimanên din hatine nivîsandin, bêne wergerandin da ku pir alternatîf û zanînek pir û berfireh ji bo xwendevanan bê pêşkêşkirin.

Kurdên ku di ferqa wê kêmasiya diroknivîsînê de ne, pêwîst e hewl bidin ku wê valatiyê tijî bikin heke ne wiha be pêşî li îdîa û tîz û nivîsandinên ne ciddî nayê girtin. Ancax li ser vê zengîniyê û berfirehî ya fakt û waqîî şirovên kûr û yên dagirtî dikarin bîn kirin. Ne weha be, rê li pêşîya kesên ku çend dokûmant û belgeyan kom dike û digihîjîne hevûdu bîyî ku şiroveyeke nûh û kûr bike, wek kitêbekê pêşkêşî xwendevanan dike, nayê girtin. Di gel vê jî nivîsîna dirokî ya Kurda pêwîst e ji bo texmîn, tez û îdeayên nuh re vekirî be. Çunkî valahiya ku îro di warê diroknivîsînê de heye rê jî bo her ihtîmal û îdîayan vekirî hêla ye. Ji bona ku berhemên dagirtî û yên ku di serê xwendevan de resmekê teşkil bikin, bîn afirandin, pêwîstî bi bîngehêkî zengîn e bi waqîa û faktan heye. Çunkî diroknasê ku bê kesdarî û bê fakt wek dareke bê kok û reh e. Eynî tişt jî bo fakt û kesdarî jî derbas dibe. Kesdarî û faktên bê diroknas tiştên mirî û bê mane ne.

# BEROŞ



Mahmûd Lewendî

## ECAÎBATÊN DUNYAYÊ

Hawar, Ronahî û Roja Nû ya ku Bedirxaniyan di salên 1932-1945' an li Beyrût û Şamê derdixistin wek Qur'ana ezîmşah li ber serê mûn in, her şev ez ji xwe re dixwînim. Her cara ku ez dixwînim jî, rastî tiştêkî nû tîm. Îcar vê carê jî di Ronahîyê de ez rastî van adetên ecayîb ên hin milletan hatim. Welleh hema min got ezê wê ji nû ve di vê quncikê de pêşkêşî xwendevanên Armanca bikim.

-Tê gotin ku Tatarên Asya Navîn gava ku bixwestana mirovekî bîezimandana şivê, diçûn mala wî û bî ku jê re tiştêkî bibêjin guheki wî dikişandin.

-Li Çînê eger mirovek li jina xwe xe, mirovên jinikê li pêş mirovên mêrik heştê çoyî li mêrik dixin.

-Li gor adetên reşikên Afrikayî heke jinik nizanibe girarê çêke mêrik dikare wê berde.

-Misiriyên kevn zarokên xwe yên pêşîn dikuştin. Ji wan ve welê bû ku bi kuştina wî zêdehiya malbatê pirtir dibû.

-Li Tîbetê du bira jî xwe re karin jinekê bînin. Lê ger zarokên wan çê bibe, hemî li ser birayê mezin tê hesabandin.

## DU YEKBÛNCÎ Û NE-YEKBÛNCÎYEK

Du Yekbûncî bi yekî Ne-Yekbûncî re suhbetê dîkin. Suhbet dibe suhbet-munaqêşe. Munaqêşe tê ser program û dîtinên rêxistina Yekbûnê. Wele axirkê, herduyên Yekbûncî di vê suhbet û munaqêşeyê de didin diyarkirin daku yê Ne-Yekbûncî jî bibe Yekbûncî. Ne-Yekbûncî bi vê yekê vardiqile û jî Yekbûncîyan dipirse:


-Baş e, hûn li Kurdistanê derheqê şewitandina dibistanan de çi difikirin?

Ji Yekbûncîyan yek difikire ku bibêje "ne baş e", Yekbûncîyê din xwe di ber ra dike û dibêje:

-Welleh baş e, çimkî mekteb zarokên me asîmîle dîkin, ez pê re me ku bişewitînim.

Yekbûncîyê din:

-Ez ne pê re me, çunkî wexta ku te dibistan



şewitand divê ku tu li şûna wê alternatîfa xwe bînî.

Ne-Yekbûncî:

-Ma hûn her yek tiş-tekî dibêjin, çawa dibe?

Yekbûncîyê ku li dij şewitandinê ye:

-Birako, heke te mekteb şewitandin divê a va ye ev heval, na heke tu li dij şewitandinê yî, a va ye ez, fermo were em bi hev re bixebitin.

## ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

◆ Kabloya bi TAT-8 binavkirî di navbera DYA û Firansayê de di bin avê de hatiye bi cî kirin. Dirêjîya wê kabloyê 6740 km. ye. Bi wê kabloyê di carekê de mirov dikare 37500 car telefon bike. Welatên Îskandinavyayê jî xetên xwe yên telekomunikasyonê bi wê kabloyê girêdane. Di sala 1989-1990'î de ev kablo gihandibûn Îtalya, Yunanistan, Tirkiyê û Îsraîlê jî. Keştiya ku wê kabloyê li bin behrê bi cih dike dikare 5500 km kablo bar bike.

Bi kabloya TAT-9 mirov dikare di eynî wextê de 80.000 caran telefon bike.

◆ Cînek ji reqên behrê ku navê wê Karette ye dikare heya 70 salî bijî.

◆ Li dinê jî milyonekî zêdetir cînsên heywana hene. Lêkolîner di vê babetê de wekhev nafikirin ji ber ku hin cînsên heywanan herçiqas wekhev bin jî ji ber rewşa tebiyetê rengên wan jî hev cûda ne û dikarin bi hev re çêlikan çêbikin. Îcar mirov heywanên wiha wek du cîns qebûl bike, hejmar digihîje du milyonî.

◆ Febrîka teyarê ya Mc Donnell Douglas di nav 10 salên pêşîya me de wê teyara herî mezin çêbike. Li gor planên wan, wê teyare kurttir, qalintir û duqat be û wê bikaribe 700 rêwî hilde.

◆ Masiyê mezintirîn yê heya îro, balînayek e û di sala 1919'an de hatiye girtin. Dirêjîya wî masiyê 18,5 m û giraniya wî jî 93 ton bûye.

◆ Pîveka kevintirîn pîveka giranî be ka ye û B.Z.Î (Berê Zayîna Îsa) nêzî di sala 3800'an de li Misrê hatiye bikaranîn.